



Bêyî hin hêzan jî dê Kongreya Neteweyî pêk were Di 21'ê adarê de pêngaveke nû

Rojên 19-20'ê meha berfanbarê li paytexta Belçîka, Brûkselê civînek hate marûsîtn. Li gorî encamnameya sîmê, dê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê di 21'ê adarê de bê daxuyandin. Di encamnameyê de piştgirî bo Ocalanî hate ragihandin. Her wiha piştî Kongreya Neteweyî dê ji nav PKDW'ê hikûmetek bo Bakur bê damezirandin. Li aliyê din kurdan jî niha ve xebata lidarxistina konferanseke navneteweyî daye destpêkirin. (R.3)




Serê salê binê salê

Azadî bibe para vî gelî...!

Dîroknameya sala 1998'an (rûpel 8-9)

Lêkolîn: "Polîtîkayên pişaftinê..."	- Rûpel 16	Mahmut Kılınc: Ji bo Kongreya Neteweyî	r.5
Hevpeyvîn: Mirina reş a zer û ya zêr	- Rûpel 6	Serkan Brûsk: Ziman, nivîskar û romana kurdî	r.7
Şehîd-Bîranîn: "Bila xort xwe neşewitînin"	- Rûpel 11	Bekir Şivanî: Kongreya Neteweyî	r.11
Wêje: Wan dilê xwe ji Hüseyin re şand	- Rûpel 10	Osman Özçelik: Partiya Çep a Swêdê û Hadep	r.13

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Stêra me bilind û geş e

Bî şer û berxwedanê salek li pey ma. Dewleta tirk di serê salê de armanca bitenêhiştin û jîhêzexistina tevgera gelê kurd dabû ber xwe. Ji bo pêkanîna vê armancê rayedarên dewletê xwe ji şerê herêmi jî nedan alî. Tê zanîn ku di vî şerî dewleta tirk ne bi serê xwe ye, li pişt wê Amerîka û Îsrail hene. Her wiha diyar e ku ew her du dewlet, ji bo pêkanîna hinek armancên xwe dewleta tirk wekî çek bi kar tînin.

Gelê kurd hê di destpêka salê de ev daxwaza dagirkeran di ber dilê wan de hişt. Destpêka sala kurdî ango Newroz, bû nişan xurtiya tevgera gelê kurd. Bi pîrozbahiyê gelê kurd da zanîn ku wan Konsepta 1993'yan di avê de biriyê û de Konsepta 1998'an jî di avê de bibin. Lê di heman katê de rayedarên dewletê îcar xwespartina Şemdin Sakik ji xwe re kir hincet û dest bi şerê psikolojîk kirin. Şerê psikolojîk gihîşt asta herî bilind. Mirovekî ku ji şer reviyaye û xwe spartiyê hêzên PDK'ê, wekî şervanê paye-

berztirîn hate ragihandin.

Bi şerê psikolojîk re, êrişên li ser saziyên demokratîk jî gurtir bûn. Hemû saziyên çandî, siyasî û ragihandinê, bûn hedefa êrişên dewletê. Bi taybetî saziyên wekî IHD, NÇM, Ûlkede Gündem û dawîya dawîn jî Azadiya Welat ji Kurdistanê hatin vederkirin. Armanca, li aliyekî baskokirina tevgera demokratîk, li aliyekî jî birîna dengê gelê kurd bû. Piştî ku di civîneke MGK'ê de kurdên li metropolan wekî hedef hatin nîşandayîn, îcar hêzên dewletê berê xwe da saziyên li metropolan. Di serî de avahiya navenda giştî, hemû avahiyên HADEP'ê bûn warê cerdên hêzên dewletê. Di serî de serok û rayedarên partiyê bi hezaran endamên partiyê hatin derdestkirin. Ji wan bi sedan kes bi biryara DGM'ê hatin girtin û hê jî di girtgehê de ne.

Divê bê gotin ku gelê kurd digel daxwaza xwe ya azadiyê, dest ji doza xwe ya pêkanîna aştiyêke birûmet jî berne-da. Di 28'ê gelawêjê de Serokê Giştî yê PKK'ê agirbesteke yekalî ku dê di Roja

Aştîyê ya Cihanê de dest pê bike, diyar kir. Mercên aştiyê jî bi awayekî zelal û diyar danîn. Lê mixabin hêzên dagirker dest ji şerxwaziyê berneda.

Bi çûna Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bo Romayê, geşedana tevgera azadîxwaz a gelê kurd jî, êrişên li ser gelê kurd jî gihîştin asta herî bilind. Li aliyekî kêşeya kurd di rojeva cihanê de bû mijara sereke, li aliyê din hêzên dewletê û derdorên faşist dest bi linçkirina mirovên welatparêz kir.

Tevî vê yekê jî gelê kurd berxwedana xwe domand, hê jî didomîne. Li hundir gelê kurd tevî hemû astengî û êrişan li HADEP'ê civiyaye, bi biryare ku hîlbijartinê bizivirîne referandûmekê. Li derve jî gavên danîna Kongreya Nete-weyî tene avêtin. Gelê kurd bo bidest-xistina mafên xwe yê neteweyî û demokratîk her tişt daye ber çavên xwe. Tu hêz, bi gelekî ku bo doza azadiyê rabûye ser piyan, nikarin.

Bi vê bîr û baweriyê em sala we ya nû pîroz dikin û dibêjin stêra gelê kurd bilind û geş e.

Gelê kurd bo dabînkirina mafên xwe yê neteweyî her tişt daye ber çavên xwe. Tu hêz, bi gelekî ku bo doza xwe rabûye ser piyan, nikarin.

Dijminê gelê tirk kî ye?

ADAR JIYAN

Ferhengok

- | | |
|---|--|
| kanik: göz kapağı | nêçira kew hwd. tê çêkirin. |
| xazê: xwarzê | dabînkirin: garan-tîkirin |
| mêristan: akraba veya sosyal çevre | yeksan: wekîhev (eşit) |
| şorê berê: gotina pêşyan | encamname: sonuç bildirgesi |
| mit: budak | gewre: mezin |
| şaban: xêlî (duvak) | guncaw: guncan, lêhatî |
| gilgolo: bager (firtina) | peyam: mesaj |
| paşilbûn: ducanî, bihemlebûn | pêngav: atilim |
| xenzik: kiler | nasname: kimlik karti |
| nivan: mêvan | nasnav: pênas (kimlik) |
| silim: nêrdiven | sazûmankar: organizator |
| xilok: kevîrên biçûk | desthilatî: iqtidar |
| gan: can | damezrandîn: avakirin (kurmak) |
| ganî: canî | asteng: engel |
| çelziman: zimandirêj | raberkirin: pêşkêşkirin |
| flar: sol, pêlav | zanistî: ilmî |
| qulbik: çapa | vederkirin: derxistin; sirgûnkirin |
| goçavik: berçavk | pêgeh: kapsam, alan |
| kurdik: caket | qeyran: krîz |
| max: beşên xênî | berbendkirin: engelleme, yasaklama. |
| kûsik: şîşe | pêşbir: xerac |
| tot: kund, bûm | |
| gildema: gulaberojkê | |
| xwêdîn: cihê ku pez lê tê xwêkirin | |
| keşk: tarhana | |
| sindif: kilidê bo sewalan | |
| evsing: cihê ku bo | |

Dewlet, diyardeyêke dîrokî ye. Hêzên serdest ên civaka kolumend, ji bo ku xwe biparêzin û radestî koleyan nebin, rêxistineke wisa damezirandine.

Di hemû qonaxên dîrokî de, dewletê wezîfeya parastina hêzên mêtînger bi cih aniyê. Îro dewlet bi têkiliyên navneteweyî bûne rêxistinên berfireh û karîger. Her dewlet li gorî berjewendiyên çinên xwe yê serdest tevdigere. Sazi-yên mîna artêş, polîs, dadmendî, perwerdehî, çapemenî, aborî, çandî û hunerî hwd. ji bo parastina vî pergalê tene saz kirin. Dewlet, di hemû heyaman de bûye rêxistineke çekdar û hêzên serdest parastine. Dewlet mafên gelan û berjewendiyên wan naporêze. Digel hemû çewisandin û neheqiyên wê jî, dewlet ji aliyê bîndestan ve tê parastin. Welatekî ku bi serjimara xwe 6070 milyon e ji aliyê hindikahi-yekê ve tê birêvebirin û ev hindikahiya ku eniya wê xwêdan nade, sererd û bînerdên welêt li gorî berjewendiyên xwe bi kar tîne û mirovên wî welatî jî dike xulamê xwe.

Îro serjimara Pakîstanê 150 milyon e. Lê tevaya vî 150 milyonî ji bo çend malbatên Pakîstanî dixebitin. Rewşa piraniya welatên cihanê bi vî awayî ye û piraniya mirovan di nava xizanî û belengaziyê de ne. Li aliyê

din dewletên mêtînger ketine pêşbaziya çekên kîmyevî û şerê fezayê. Gelên van welatan jî li ser tingê ji bo têrkirina zikê xwe xwarinê berhev dikin.

Rewşa gelên Rohhilata Navîn ji rewşa wan gelan xirabtir e. Bi vî rasti-yê ve girêdayî, rewşa gelên Kurdistan û Anatoliyê jî li ber çavan e. Dewleta tirk bo berjewendiya çend kesan li Kurdistanê kevir li ser kevir nehiştîye. Dîsa ji bo berjewendiya

Piraniya mirovan di nava xizanî û belengaziyê de ne. Lê dewletên mêtînger ketine pêşbaziya çekên kîmyevî û şerê fezayê. Gel jî li ser tingê ji bo têrkirina zikê xwe xwarinê berhev dikin.

çinên serdest gelên tirk û kurd bi hev û din dide kuştin û li ser xwîna zarokên gelan politikayên bikirêt dimeşîne. Ji bilî birjuwaziya tirk ev dewlet bi kêrî kê tê?

Bi rastî gelê tirk bidewleta xwe re li hev e. Lewre nîzane dewlet ji bo kê xizmet dike. Hê ew dewleta xwe wekî bav dibîne. Hê ew dewletê pîroz û bêqisûr dibîne. Ji xudanekî ku ji hêstirên çavan û xizaniyê pê ve tiştek nedaye wî re evdîtiyê dike. Kesekî ku vî yekê pê bide fêmkirin nîn e. Li dijî dewletê tu rêxistinên tirk bi awayekî zelal muxalefeta xwe diyar

nekirîye. Îro dewlet tenê tevgera kurd muxalîf dibîne. Ji ber vî jî hemû hêzên xwe yê hov û hemû derfetên xwe êrişî wî gelî dike. Gelo gelê tirk di ber kê de şer dike? Gelê tirk jî ji vî şerî gelek zirarê dibîne. Lê mixabin ku kesekî ku gelê tirk haydar bike nîn e. Heta îro ji eniya tirk dengê dijber û radîkal derneketîye. Dîsa ji çepgirên wan heta rastgirên wan, ji sosyalîstên wan heta îslamiyê wan, tu kesî banga aştiyê bilind nekirîye.

Me got dewleta tirk xisara herî mezin li gelê tirk dike. Lewre vî şerê qirêj li ser xwîna û hêstirên wî didomîne. Ji ber ku lêçûnên vî şerî ji bêrîka wî derdikeve. Ji ber ku birayê wî (kurd) jê re dike dijmin. Gelo di dîroka mirovahiyê de tu gelan, wekî gelê tirk ji destê dewleta xwe ev qas zerar dîtîye? Em bibêjin ku gelê kurd jî bo mafên xwe yê rewşa şer dike. Tiştêkî ku wînda bike nemaye. Hem jî di ber xwe û hemû gelên cihanê de şer dike. Îcar gelê tirk di ber kê de xwîna xwe dirijîne, an kîjan welatî jî bo kê diparêze? Wekî ku me li jor jî got, dewlet jî bo berjewendiyên çinên serdest û hêzên mêtînger hêye û bi hemû sazî û dezgehên xwe ve di bin fermaya wan de dixebite. Lê dîsa çerxa dewletê jî li ser milê gelan dizivire. Heke gel bi rêxistin û bi biryar li hev xwedî derkevin û li dijî pergalên serdest rawestin, tu dewlet nikare li ser piyan bimîne.

Şeyî hin hêzan jî dê Kongreya Neteweyî pêk were

Di 21'ê adarê de pêngaveke nû

Öcalan da zanîn ku, DYA û K.T nikare hêzên wekî PDK'ê biparêze, dema ku wan xwe sîparte şahê Îranê Komkujiya Halepçeyê pêk hat. Wî diyar kir ku îro ew xwe dispêrin dewleta tirk, wê K.T jî şahê Îranê xerabtir tevbigere. Öcalan got: "Kurdayefî ne tiştêkî erzane, ger em tunebûna dewleta tirk bo wan tiştêkî nedikir. Lê ew bi Ecevît re dikevin tîkiliyê, ger siberoj tiştêkî pêk were, berpîrs ne yê ku komkujiî pêk aniye, yê ku bingeh daniye."

Rojên 19-20'ê meha berfanbarê li paytexta Belçîka Brukselê bo amadehiya bingeha Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê civînekê berfireh hate lidarxistin. Li dora 21 rêxistinên politîk ên Kurdistanê, 15 rêxistinên pişeyî û rewşenbîrên kurd, 75 kesayetiyan Kurdistanê û her wiha jî hemû parçeyên Kurdistanê kesên serbixwe, oldar û niştimanperwer beşdarî civînê bûn. Di dawiya civînê de bo raya giştî encamnameyek hate ragihandin. Di encamnameyê de li ser kêşeya kurd, rûdanên dawîn yê di qada navneteweyî de, çûyina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bo Romayê, Yekîtiya Ewropayê, însiyalîfa çareseriyê kêşeya kurd û li ser piştigiriyê bo Serokatiya PKK'ê hate rawestî.

Peyman divê ne li dijî kurdan be

Di encamnameyê de lihevhatina YNK û PDK'ê ya bi riya Peymana Washingtonê bi awayekî erênî tê pêşwazî kirin û ji her du partiyên tê xwestin ku li gorî demokrasî û mafên mirovan û her wiha berjewendiyên gelê kurd tevbigerin. Li aliyê din tê daxwazkirin ku PDK bersiva agirbesta PKK'ê lê vegevine. Wekî din beşdarên civînê piştigiriyê agirbesta yekalî ya PKK'ê ya bo dewleta tirk dikin û ji dewleta tirk dixwazin ku kêşeya kurd bi şeweyekî politîk û aştiyane çareser bike.

Di encamnameya civînê de ji bo helwesta dostane ya Serok Wezîrê Îtalya Massimo D'Alema û gelê îtalî spasdariya gelê kurd tê arastekirin û ji rayedarên Îtalyayê tê xwestin ku ew statûyeke siyasî bidin Öcalan. Her wiha banga di zûtirîn katê de bicihanîna biryarên Parlamentoya Ewropayê; wekî lidarxistina konferansa navneteweyî bo çareseriyê kêşeya kurd, bo dewletên Yekîtiya Ewropayê tê kirin. Her wisa ji Amerîkayê tê daxwazkirin ku di çareseriyê

kêşeya kurd te bi taybetî jî, bo kurdên bakur bi roleke erênî û pozîtîf rabe. Dîsa di encamnameya civînê de behelwestiya dewletên ereb ya bo kêşeya kurd tê berbiçavkirin û ji Neteweyên Yekbûyî tê xwestin ku di çarçoveya pîvanên xwe de bo kurdan mafê çarenûsiyê dabînin bike. Wekî din piştigiriyê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan tê kirin û tê diyarkirin ku mafê gelê kurd, asûrî-suryanî û kêmteweyên din yê Kurdistanê

cihanê. Tiştê ku pêşeroja me dabînin (garantî) dike jî yekîtiya me ye." Öcalan di berdewama axaftina xwe de bi ser rêxistinên ku beşdarî civînê nebûne de rexne barandin û wiha got: "Divê mirov îro zêdetir kar bike. Eger dil bikin bo gelê xwe tiştêkî bikin û bo azadiya Kurdistanê tîbikoşin, divê hinekî serwest bin. Di damezrîna K.T de li ser kurdan tevkujiî û komployên mezînan pêk hatin. Heman tişt li Mahabadê jî pêk anîn. Eger ew



Dîmenek ji civîna encamnameya Kongreya Neteweyî ya ku li Bruksel hate lidarxistin. Di civînê de bang li hemû hêzên Kurdistanê hate kirin.

wekî yeksan e. Me jî li ser vê yekê bi berpîrsê Komîteya Amadekar Zübeyir Aydar, siyasetmedar û nivîskar Îbrahîm Ehmed û Dr. Mahmud Osman re lêpîrsînek pêk anî. Wan her sê kesên pêwîstiya Kongreya Neteweyî anî ziman û xwest ku hêzên li derve jî beşdar bibin. Her wiha der barê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî di MED-TV de beşdarî panelêkê bû û nixandinek kir.

"Hikûmetekê jî damezrînin"

Öcalan, di nixandina xwe ya televîzyonê de peyama damezrandina hikûmetekê jî da û da zanîn ku divê ew jixwebawer û bêtirs hikûmetekê jî damezrînin û wisa got: "Şert û mercên me guncav in, em ketine rojeva

problema yekîtiyê tunebûya, niha me gelek tişt bi dest xistibûn. Hinekî wêrek bin, PKK wisa tevbigere. Em jî dema yek bin, tu kes nikare li ser me tevkujiyan pêk bîne. PDK tê li ser navê dewleta tirk operasyonan lidarxîne. Ma kurdekî binamûs dikare tiştêkî wisa bike?" Öcalan da zanîn ku, DYA û KT nikarin wan biparêzine, dema ku wan xwe sîparte Şahê Îranê Komkujiya Halepçeyê pêk hat. Wî, diyar kir ku îro ew xwe dispêrin dewleta tirk, wê K.T jî şahê Îranê xerabtir tevbigere. Öcalan wiha dirêjî da axaftina xwe: "Kurdayefî ne tiştêkî erzane, ger em nînbûna, dewleta tirk tiştêkî bo wan nedikir. Lê ew bi Ecevît re dikevin tîkiliyê. Ger siberoj tiştêkî pêk were, berpîrs ne yê ku komkujiî pêk aniye, yê ku bingeh daniye."

AZAD ALTUN

Neteweya kurd gavên xwe rizgarkirinê diavêje

□ Nivîskar û siyasetmedar Îbrahîm Ehmed: Di sala 1937'an de Peymana Sadabadê hate girêdan. Kovareke hindî li ser peymanê gotibû, ev peyman ne li dijî Sovyetistanê ye. Ev kongre bo başiya miletê kurd e, ne li dijî miletê kurd e. Eger berê xebateke wisa hebûya, evqas kuştin pêk nedihatî. Îro bi saya şoreşa PKK'ê, şoreşa aştiyaxwazan, dostan bi şeweyekî cihanî dest pê kiriye. Neteweya kurd gavên xwe bo xwerizgarkirinê diavêje. Dijminê kurdan bi taybetî jî Tirkiye bi riya jenosîdê kurd ajotin derveyî welêt. Em kurdên li derveyî welêt yê ku beramberî wan zilman mane, îro amadehiya kongreyeke neteweyî dikin. Ev jî bi saya PKK û dilsozan pêk hat. PDK îro dewra kurdayetiye nabîne. Ew di nav dijayetiya miletê xwe de ye. Eger ew li hemberî milet tobeya xwe bîne zimên, bi xêr ew jî dikare bibe hêzeke miletê kurd. Lê ez ne bawer im ew beşdarî kongreyê bibe. Ew di rêka kurdî de nîn e. Ew ligel gewretirîn dijminê kurdan hevkar e. Lê dîsa jî wê Kongreya Neteweyî pêk were.

□ Endamê Komîteya Amadekar Zübeyir Aydar: Kongreya Neteweyî jî bo stratejiya kurdan dezgeheke pêwîst e. Di civînê de ne tenê li ser kongreyê hate axivîn. Rojeva Kurdistanê jî hate nîqaşkirin. Em li ser Bûyerên li Başûr, Şerê Kendavê, Qeyrana Suriyeyê, li Kurdistanê gavên aştiyane, agirbest û her wiha hatina birêz Öcalan ya Romayê axivîn. Tiştê herî girîng biryar hate girtin ku Kongreya Neteweyî di navbera sê mehan de were avakirin. Li tu dewletan yekîtiya hemû hêzan pêk nehatiye. Em dixwazin hemû hêz di nav vê pêvajoyê de cihê xwe bigirin. Lê ku elî û weli neyên gelê kurd jî nikare îradeya xwe bi wan ve girêbide. Piştî ku kongre pêk hat, em lê difikirin ji nav parlamentoyê bo Bakur hikûmetekê damezrînin.

□ Nivîskar û siyasetmedar Dr. Mahmud Osman: Kêşeya girîng, şerê di navbera PKK û PDK'ê de ye. Divê diyalog hebe. Lê di nav meseleyê de dewleta tirk heye. Dewleta tirk jî dijminê kurdan e. Enqere dixwaze kurdên Başûr bike dijminê kurdên Bakur. Ez bawer im piştî sê mehan ew jî dê beşdarî civînê bibin. Bila werin çarçoveyê neteweyî deynin. Bila dengê derkeve û li cihanê biaxive. Ger hêzên din neyên jî, wê kongre pêk were, lê dê kongre dijwar bibe. Bi hatina birêz Öcalan bo Romayê kurd bêhtir li hev civiyan. Ketine rojeva cihanê. Bila hêzên din vê fersendê bikar bînin. Divê hemû dewlet û em zorê li Tirkiyeyê bikin ku bersiva agirbesta PKK'ê bide. Divê statûya siyasî bidin birêz Öcalan, da ku ew jî karê xwe bike. Dibêjin terorîst e. Lê terorîsta gewre dewleta tirk e. Eger dadgehek hebe, divê ew ne ji bo birêz Öcalan, ji bo dewleta tirk were danîn. Ji ber ku wê bi salan kurd kuştin.

Polîtîkayên pişaftinê yên mêtîngeran

Li pey Şerê Cihanê yê Yekemîn dewletên ku li ser Kurdistanê serdest bûn, di her warê jiyandê de saziyên ku li ser bingeha ziman û çanda neteweyên serdest dirûv girtibû, dihate saz kirin. Sazibûnên ku di warê aborî, siyasî, civakî û çandî de zimanekî yekpare û fermî pêk tînin, derketin holê. Bi taybetî jî bo pişaftin a gelê kurd saziyên perwerdehiyê û navgînên ragihandinê bi gurehî hatin bikaranîn.

Li gorî piraniya lêkolînên zanistî piştî hilweşîna Împaratoriya Mehdan kurdan piştî xwe rast nekiriye û dewleteke serbixwe ava nekiriye. Bi giştî awayekî nîvserbixwe di bin rêveberiyên herêmî; mîrekan de jiyana xwe domandiye. Kurdistan bi demeke dûvedirêj bûye qada şer û pozberiyên di navbera Dewletên Îran û Osmanîyan de; geh ketiye bin destê Îranê geh ketiye bin destê Osmanîyan

Kurdistan cara pêşîn bi awayekî fermî di navbera dewletên Osmanî û Îranê de bi Peymana Qesra Şerîn hate parvekirin û di sedsala 20'an de di serdema parçebûna Dewleta Osmanî de di bin bandora Rûsya, Îngilîstan û Franseyê de ma.

Piştî sedsala 19'an

Wekî tê zanîn ziman û çanda kurdî hetanî sedsala 19'an bi awayekî serbest û serbixwe bi pêş ve çû û perisî. Hetanî vê sedsalê mêtîngeran li hemberî zimanê kurdî tu astengî dernexistin. Jixwe rewşa dewletên Osmanî û Îranê jî bo rêlibergirtina zimanê kurdî ne musaft

Dîsa ev polîtîka bi sala 1930'î re tundtir dibin û daxwazên kirêt ên bincilkirî eşkeretir dibe: "An tuyê li pêş tirkan serê xwe bitewînin an jî ji vir herî. Di vî warî de nêzîktêdayina Wezîrê Dadê yê 1930'yî Mahmut Esat Bozkurt balkêş û bi îbret e: "Li vî welaî bi tenê mafekî kesên ku ne tirk in heye, ew jî mafê kolebûnê."

bû. Lewre Împaratoriya navborî li erdnîgariyeke gelekî fireh serdest bûn; hem gelek gel di nav xwe de dihewandin hem jî li ser vî esasî bi awayekî sist tevdişeriyên.

Hêzên ku Kurdistan di navbera xwe de kiribûn du par, zimanên xwe yên fermî bi tenê di saziyên leşkerî û sîvil de bi kar dianîn.

Li Kurdistanê ev sazî di sedsala 19'an de piştî ku rêveberiyên navendî (Îran, Osmanî) nîrên ku kiribûn stuyên gelan şidandin û diranên xwe tûj kirin, jî

navê rabûn. Li pey Şerê Cihanê yê Yekemîn dewletên ku li ser Kurdistanê serdest bûn, di her warê jiyandê de saziyên ku li ser bingeha ziman û çanda neteweyên serdest dirûv girtibû, saz kirin. Sazibûnên ku di warê aborî, siyasî, civakî û çandî de zimanekî yekpare û fermî pêk tînin, derketin holê. Bi taybetî jî bo pişaftin (asimilasyon) a gelê kurd saziyên perwerdehiyê û navgînên ragihandinê bi gurehî hatin bikaranîn.

Di dema Şerê Cihanê yê Yekemîn de

Piştî ku dewleta Osmanî di encama Şerê Cihanê yê Yekemîn de tîk çû beşên Kurdistanê yên li ser Sûriyeyê û Iraqê jî ji destê wê derketin. Her wiha di navbera salên 1918 û 1920'an de hin bajarên ku li ser bakurê Kurdistanê ne jî ketin bin destê Franse û Îngilîstanê. Di vî serdemê de bi taybetî Îngilîstanê li aliyekî kurdî binê pest û çewisandinan hiştin, li aliyê din jî li Kurdistanê li ser

çand û zimanê kurdî lêkolîn û lêgerînên zanyarî kirin.

Di salên 1920'an de Şêx Mehmûd Berzencî li dora Bajarê Silêmaniyê dewletekê dadimezirîne û di nava sînoren vî dewletê de li ser ziman û çanda kurdan xebatên bikêr tîne kirin. Dîsa Simkoyê Şikak li rojhilatê Kurdistanê dewletekê dadimezirîne û weşana pêşîn bi zimanê kurdî diweşîne. Lê ev her du hewldanên navborî jî di encama dek û dolabên Tirkiye, Îran û Îngilîstanê de di avê de diçin.



Her wiha li rojhilatê Kurdistanê di bin serkêşiyê Qazî Mihemed de di 22'yê rêbendana 1946'an de Komara Mehabadê tê damezirandin. Zimanê kurdî li seranserê herêma wekî zimanê fermî tê pejirandin. Di hemû dibistanan de kurdî dibê zimanê perwerdehiyê. Dîsa di vî demê de bi tevî weşana hikûmeta Komarê; Rojnameya Kurdistan, kovarên mehane Hawar û Agir, jî bo jinan jî Kovara Helale tîne weşandin. Li aliyê din bi navê "Dayikî Niştîman" listikek tê lidarxistin û ev listik gelekî balê dikişîne. Her wiha gelek pirtûk tîne weşandin. Ev dewlet li seranserê Kurdistanê bandoreke mezin çêdike û bala hemû kurdan dikişîne ser xwe. Her çiqas komara navborî bo ziman û çanda kurdî bê westan û rawestan hewl dabe jî bi ser neket. Lewre li herêmeke teng hate damezirandin û tevaya kurdan nedi mand.

Serdema berî Lozanê

Li Tirkiyeyê Mustafa Kemal di sala 1920'an de Meclîsa Tirk (TBMM) an bi vî rengî dide nasandin: "Meclîs (TBMM) berhema tirk û kurdan a hevbeş e." Dîsa di axaftineke xwe ya ku sala 1921'ê dike de wiha dibêje: "Ger şeniyê herêmên ku kurd lê serdest in û hejmara wan pir e bixwaze, em jî bo dayina otonomiyê (nîvserxwebûn) amade ne. Her wiha di hevdişinên ku li Lozanê tîne kirin de Mustafa Kemal wiha dibêje: "Komara Tirk, a kurd û tirkan e." Lê ev gotinên ne jidil bi sala 1924'an re serdanpê berevajî dibin. Ev polîtîkayên nijadperest ku jê fen û fût difûrin bi van gotinan berbiçav dibin: "Neteweya tirk", "Neteweya tirk a efendî." Dîsa ev polîtîka bi sala 1930'yî re tundtir dibin û daxwazên kirêt ên bincilkirî eşkeretir di-

bin: "An tuyê li pêş tirkan serê xwe bitewînin an jî tuyê ji vir herî. Di vî warî nêzîktêdayina Wezîrê Dadê yê wê demê Mahmut Esat Bozkurt ku di 1930'yî de di axaftineke xwe de diyar kiriye gelek balkêş û bi îbret e. Axaftina wî bi vî rengî ye: "Li vî welaî bi tenê mafekî kesên ku ne tirk in heye, ew jî mafê kolebûnê ye." Li ser vî bingehê dewlet nasnameya kurdan înkâr dike û Mustafa Kemal her westa dewletê ya pişafker wiha bi lêvê xwe ke: "Bi navê kurdî zimanek tune ye. Bi vî yekê ve girêdayî zimanê kurdî qedexekirin. Li ser vî yekê Emîr Celadet Bedirxan di sala 1933'yan de Mustafa Kemal re nameyekê dişîne, tîkî û kurdî dide ber hev, nimûneyan zengînî û berfirehiya kurdî dide.

Piştî ku Kurdistan ji aliyê mêtîngeran ve bi Peymana Lozanê hate parvekirin bû çar par, êdî li hemberî ziman û nîrên neteweyî yê kurdan polîtîka û helwestê hevbeş û fermî yên dewletên serdest xwe bi gelekî eşkere û sayî didin de Kurdistan ji aliyê çar dewletan ve hatî parvekirin. Her dewletek li gorî mercên xwe yên erdnîgarî, aborî, civakî hewl xwedî xweserî û taybetiyên cuda yên Lewre jî li dijî nasnava kurdan û zimanê kurdî helwest û nêzîktêdayinên wan cuda bin.

Di pirtûka Emir Hasanpur a bi navê "Polîtîkayên Dewletan ên Derbarê Zimanê Kurdî de û Mafên Zimên" de li ser polîtîkayên dewletên mêtîngeran der barê zimanê kurdî de dahûrandinên analîzîke) eke zanyarî û balkêş heye. Hasanpur polîtîkayên dewletên Îran, Tirkiye û Sûriyeyê yên ji sala 1918'an hetanî roja îroyîn yekê yê dadihûrîne. (Dê bidome)

Kurdî: Zimanekî Îndo-Ewrûpî (2)

Zaravayên kurdî-kurmancî

- Kurmanciya bakur (kurmancî)**
- *Li Îranê, hozên herkî, milan, şekak, celalî û herderî li herêmên bakur û rojavayê eyaleta Azerbaycanê.
- *Li Îranê kurd li Xoresanê.
- *Li Tirkîyeyê hemû kurdên li Erzîrom, Bazîd, Hekarî, Şemdînan, Behdînan, Abdîn, Mêrdîn û Amedê.
- *Hemû kurdên ku Yekîtiya Sovyetê ya berê dijîn.
- *Li Iraqê piraniya hozên ku li Akra, Amediye, Zaxo, Sancar û Musilê.
- *Li Sûriyeyê hemû kurd.

Kurmanciya navendî (soranî)

- *Li Iraqê piraniya kurdên ku li Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr û Rewandûzê.
- *Li Îranê ji başûr gola Rezaiye heta rojavayê Kîrmanşahê, ew di nava xwe de dibe du beş: Kurmanciya Mukrî ya Mahabadê û Kurmanciya Senendejê.

Kurmanciya Başûr

- *Kîrmanşahî
- *Goranî
- *Sencabî
- *Kelhûrî
- *Kolyawî
- *Zaravayê sahne û hersînê

Zaravayên hewramî

- *Zaza/dimilî/kirmanckî zaravayê Dêrsimê
- *Hewramiya text
- *Hewramaniya lehon
- *Zaravayê cavrûd
- *Zaravayê paveh û ciwanrûd
- *Goraniya kevn (zimanê Ehli Heq)
- *Zaravayê olî yê mako mako
- *Zaravayê gehware yê kevn
- *Zaravayê Korejowê yê kevn
- *Zaravayê bîvencî yê kevn
- *Zaravayê kinduleh ê kevn
- *Zaravayên bajarên ê li herêma Iraqê ya li hemberî Sar-pul-e zohab.

Tê gotin ku di nava zaravayên kurdî de kurmanckî ji hêla dengsazî û peyvsaziyê ve kevnaretirîn zarava ye. (MacKenzie). Garzonî Lerch- Rhea, Chodsko, Beresin, Hornli, Peter û Fossum zaravayê soranî wekî paqjirtirîn û baştirîn zaravayê kurdî bi nav kiriye. Fossum bi taybetî çêlî komek zaravayên ku hozên Bebeh ên li herêma Silêmanî pê dipeyivin kiriye.) Soane, zaravayê soranî ya ku hozên mukrî (yên li başûrê gola Wirmiyê) pê qise dikin, ji hêla bilêvkirin û rêziman ve wekî resantirîn zaravayê kurdî bi nav kiriye. Hinek kurd bawer in ku kevnaretirîn zaravayê kurdî goranî ye. Ev dîtina li dijî dîtina wan kesan e ku zazakî û hinek devokên din ên zazakî-goranî li derveyî kurdî dihêlin. Tiştê teqez ev e ku hemû zaravayên kurdî di nava beşa Bakur-Rojava yê zimanên îranî de ne. (...)

Kurmancî-kurdî (Tablo-1)

I		I		
Kurmancî (nûjen)		Hewramî (kevn)		
I				
(Başûr)	(Navend)	(Bakur)	(Bakur)	(Başûr)
Kîrmanşahî	Soranî	Kurmancî	Dimilî	Hewramî (kîrmanckî)

Dê hejmara kurdan di sala du hezarî de bi vî rengî be: (Tabol-2)

Welat	Bakur (%)	Navendî (%)	Bi gelemperî (%)	Bi giştî (%)	giştî kurd (milyon)
Iraq	6.5	8.5	6.5	21.0	4.98
Tirkîye **	8.8	-	8.0	16	11.38
Îran*	0.4	4.5	6.0 + (7.1)	10.9+ (7.1)	8.3+ (5.29 lorî)
Sûriye	7.3	-	7.3	7.3	1.27
Lubnan	4.0	-	-	4.0	0.1309
Ermenistan	2.0	-	-	2.0	0.0648
Gurcistan	0.6	-	-	0.6	0.0341
Kîrgîzîstan	0.33	-	-	0.33	0.0170
Azerbeycan	0.2	-	-	0.2	0.0139
Kazakîstan	0.15	-	-	0.15	0.0273
Afganîstan	-	-	0.1	0.1	0.0267

Hemû kurd di sala 2000'î de

= 26.07 m.+ (5.29 lorî)

Hejmara kurdîaxêvan

Li gorî hejmarên ku ji navenda lêkolînê ya protestanên bawerîhişk a bi navê "World Evangelization Research Center" hatine girtin. (Ev agahî li Batonic World Prayer Center hene). Dê hejmara kurdan di sala du hezarî de wekî tabloya duymîn be.

*Wisa xuya ye ku 1-2 milyon kurdên Xorasanê ku bi kurmanciya bakur dipeyivin ne di nava vî îstatîstîkê de ne (Îran).

**Di nav vî îstatîstîkê de kurdên dimilîaxêv ku di sala 2000'î de hejmara


wan bibe milyonek û 165 hezar û kirmanckîaxêvên elewî ku dê hejmara wan bibe 169 hezar 400 jî, hene.

*** Kurdên li derveyî welêt ne di nav vî îstatîstîkê de ne. Her wiha ev hejmara bo her welatî li dora %6'î ji hejmara ku lêkolînerên kurd dane kêmtir in. Bo nimûne li Tirkîyê %23 kêma %16.8 yeksan e bi % 5.8'an. Ev yek dibe ku ji ber ferqa di ferqa di navbera hejmara kurdan û kurdîaxêvan be. Lewre hemû kurd bi kurdî napeyivin.

SIAMAK REZAEI DURROEI
WERGER: SAMÎ BERBANG

Ji bo Kongreya Neteweyî

MAHMUT KILINÇ



Dawiya hefteya borî li paytexta Belçîka; li bajarê Brükselê bi sazûmankariya Komîsyona Amadekar civînek ji bo damezirandina Kongreya Neteweyî pêk hat. Komîsyona Amadekar ev salek e ku vî karî dimeşîne. Par, bi beşdarbûna gelek partî, hêz û şexsiyetên Kurdîstanî civiyabû, ji nav kesên amade "Komîsyona Amadekar" hatibû hilbijartin.

Piştî vî civînê ji bo ku karê xwe bi rêk û pêk bike, hê bi hêsayî bicive, komîsyonê di nav xwe de komîteyêke navendî hilbijartibû. Heta îro, carinan Komîsyona Amadekar û bi piranî jî Komîteya Navendî civiya, kar kir û biryar standin.

Di vî civîna dawîn de Komîsyona Amadekar bi navê "Projeya Peymana Kongreya Neteweyî ya Kurdîstanê-1998" wek zagona damezirandinê dokûmanek jî amade kiribû. Dokûman, armancên kongre û çarçeweya erk û desthilatiya sazîyên di nav kongreyê de, xal bi xal rêz dike.

Rojev û amadekirina civînê eşkere dikir ku

Komîsyona Amadekar civîn hinekî bi lez û bez amade kiriye. Hatina Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan bo Romayê jî li ser rojev û amadekariya civînê tesîreke bîngehîn kiribû. Dîsa jî bi gelek partî, hêz û kesên bijarte ev civîn hatibû amadekirin. Gotûbêjêke dewlemend li ser mijarên rojane û damezirandina kongreyê hate kirin.

Damezirandina Kongreyê Neteweyî ya Kurdîstanê demeke gelek dirêj e ku bûye armanceke gelek hêz û kurdên welatparêz. Heta carinan li ser kar jî hatiye kirin. Mixabin ji ber sedemên hundirîn û derveyî heta îro tu gavên bîngehîn nehatine avêtin. Lê rastiyeke heye ku heger gelek li ser xeta yekîtiya neteweyî tevgera xwe ya civakî pêk neanibe, ji serkeftinê dûr e. Ji bo serkeftinê gava ewil yekîtiya neteweyî ye. Hêz, partî û kes li hev rexneyan digirin, lê ev li ber cihstandina di nav platformeke neteweyî de divê nebe asteng.

Bi qasî sedemên hundirîn, sedemên derveyî jî li ber yekîtiyê asteng in. Helwesta siyaseta dinyayê ya ji bo Rojhilata Navîn li ber yekîtiya neteweyî ya gelê Kurdîstanê her dem bûye asteng. Ev siyaset jî ji hêla DYA û Yekîtiya Ewrûpayê ve tê diyarkirin.

Ew dewlet dixwazin Pîrsa Kurdîstanê wekî xwe çareser bikin. Heger Teverga Kurdîstanê hevkarîya xwe ya neteweyî ava bike, wê demê kar wekî ku ew dixwazin bi rê ve naçe. Îro, ji ber ku hêz û partiyên Kurdîstanê yekîti-

ya neteweyî ava nekirine, li hemberî giraniya wan dewletan nikarin însiyatîfa xwe bidin pêş. Di gelek tiştan de li destê wan dinêrin. Ew jî gelek tiştên hê bi xetere dikin, li nik dewletên dagirker cih digirin; daxwazên wan û bi taybetî yên dewleta tirk li ber çavan digirin. Lewma jî çareserî pêk nayê.

Diyar e û her kes jî baş dizane ku dewleta tirk li çareserîya Pîrsa Kurd û Kurdîstanê nage-re, tunekirina gelê kurd ji xwe re kiriye armanc. Mirov li Kîjan hêlê dinêre, rastiyeke tê ber çavên mirov: Tunebûna yekîtiya neteweyî bi aliyekî xwe dibe sedema domkirina dagirkerî û xesara li Kurdîstanê, bi aliyekî xwe jî dibe sedema polîtîkayên neyînî yên DYA û Ye'yê yên der barê kurdan de. Dijmîn jî ji vî yekê sûdê wergidire. Dîtina kesên ku dibêjin 'şertên ku em tê de ne dest nadin', ne rast e. Divê mirov ji van kesan bipirse, ji bo ku şert dest bidin we çî kiriye an jî hûn çî dikin? Ji bo astengiyên li ber Kongreya Neteweyî divê berpirsiya hêz û partiyên jî diyar bibe.

Her çiqas li ser civat û têkoşîna kurdan ev êrîş û xesara giran hebe jî, tevî hemû astengiyên jî konjonktûr ji bo damezirandina Kongreya Neteweyî, îro jî berê zêdetir dest dide. Dengê kurdan bi têkoşîna Bakur ev panzdeh sal in ku di nav dinyayê de bilind bûye û cih girtiye. Bi taybetî hatina Serokê PKK'ê bo Romayê û Peymana Washingtonê di vî pêvajoya çareserîya Pîrsa Kurdîstanê de bûyerên girîng in.

Malbata çalaksaza fedayî Hüsniye Oruç:

“Mirina reş a zer û ya zêr”

Odeyekî tijî, bi doşeg û balgiyan raxistî, li navê gelek xwelidankên ku bi poçikên cixareyên tekel ê dagirtî, dûxana cixarê wekî mijêke tenik wegirtî. Ode mişt tijî mirov. Li nava odeyê, li meydanê çend sîni heta dev tijî cixareyên tekelê quçkirî. Ciwanekî esmer, riha wî çendekî dirêj, porê wî yê reş yê ne şeh kirî, di destê wî de sîniya çayê, bi fesal û bi marîfet, hêdika heb bi heb li mêvanan çayê belav dike.

“Li ser rihê hemû şehîdên Kurdsitanê û yê vê malbatê” fatîha hate xwendin. Piştî kêliyêk bêdengiyê, ciwamêrekî navsere, bi dengê zelal û zîz, bi hevokên li hevhatî û xweş sazkirî, lib bi lib diaxive. Hemû kesên li odeyê bi baldarî, bi aramiyekê tekûz, çav li ser axîfger, lê guhdar in. Deng; wekî ku helbesteke lirik bixwîne, nerm û melodîk. Mirinê şirove dike yan jî cureyên mirinan. Li ser rûyê camêr ifadekî sade, têgihîştî û nefsbîçûk xwe dide der.

“.....niha mirin sê reng in. Mirina reş; a zer û a zêr. Mirina reş; -ku em hêvî dikin nebe nesibê kesî- belê, mirina reş ew mirine ku, mirovên ku di jiyana xwe de îxanetî bi gelê xwe re, bi mirovahiyê re kirine û her tim di nav xirabî û çalakiyên kirêt de bûne. Mirina van kesan, mirina reş e. Ya zer; Mirina ji rêzê ye. Dibe ku bi qeza trafikê were, an ji ber nexweşiyekê. Belkî jî ji ber temenekî dirêj û vala ku êdî mirad tijî bûye. Mirina zêr; Belê ya zêrîn. Mirina bi rûmet, payebilind, berz û bala... ku nabe qismetê her kesî jî. Mirina zêrîn; Ew kesên ku di jiyana xwe de bêxîretî nepejirandine, nabîn dilê qelsî, kêmasî û nîmetên xapînok ên jiyaneke bêrûmet. Û ew li pey sererastkirina heq, hiqûq, edaletê ne. Ji bo mafên meşrû yên gelekî ku bi darê zor, bi çavsorî jê hatine standin û ji bo azadkirina gelê xwe yê mezlûm tédikoşin. Belê mirinên ku wiha di nav şertên çetîn û dijwar de tèn, mirina nerewa, belkî jî nemirînî ye. Mirin be jî, mirina zêrîn i...”

Belê, em niha li Amedê mala şehîdekê di şîna wan de ne. Tu tiştê ne rewa nexuya ye. Her tişt sade, normal û ji rêzê ye. Şehîdek ji şehîdan... Şînek ji şînan... Malek ji malan. Ji xwe zû de ye ku peyvên weke, şehîd, mirin, şewat, agir, zindan, cerd, binçavkirin, tewqîf kirin, şîn, taziye, îşkence, çalaki, berxwedan, têkoşin gel, netewe, lêdan, nûçe... bûne parçeyên herî mezin ên jiya-

na gelê kurd. Şîn, taziye êdî ne wek urf û edetên berê ne. Mala şehîdan êdî warê sohbetên politik e. Her jûre(ode) wekî studyoyên panela yên li MED-TV' yê ne. Politîkavan in tabî! Bi zimanekî xwezayî, sade, zelal û hewqas jî şareza û watedar. Wekî vexwarina çay an jî kêşana cixarê bi hêsani li ser her cure mijarê analîzên filozofî dikin.

Ez, bêyî ku bal dikişînim ser xwe, derdikevim hêwana malê. Xwe bi malbata şehîd Binevş didim nasîn. Em dikevin odeyêke biçûk. Bav, dê, bira û apê wê tèn rûdin. Li ser rûyê wan aramiyekî maxrûr lê hewqas jî nefsbîçûk. Awirên wan şareza wisa jî nerm, germ û pejinkar dixuye. Em careke din serxweşiyê didin û dipirsin:

Dema hûn pê hesiyar ku keça we çalakiyek wisa pê aniye û şehîd ketiye we çi hîs kir?

● (Bavê wê dibêje, navê xwe neda) Ne wê demê û ne jî niha ez qet xemgîn nebûme. Ev yek ne ji dilşariyê ye. Ev demeke dirêj e ku em di nav şerekî dijwar de ne. Malbata me jî -pir, hindik- di nava vî şerî de ye. Nizanim çawan bibêjim. Belkî jî, vî şerê han hin hestên me kuştine. Ta niha bi sedan bûyerên wisa çebûne. Di bihîstina şahadetên wekî Zilan, Berivan û xweşewitandinên zindanan de ez çiqas xemgîn bûme, a di di şahadeta keça xwe de jî hewqas. Ez vê yekê jî dilê xwe yê xas dibêjim.

We gotibû kêfxweşî. Belê dibe ku ji xemgînî zêdetir kêfxweşî hebe. Lê ne ku ez bi zimanekî reklamwarî bibêjim ez kêfxweş im. Ez wî heqî di xwe de nabînim. Ji ber ku di tevlibûna wê ya di nav refan û heta bigire ked û çalakiya wê de tu keda min ku ez pê pesnê xwe bidim nîn e. Ew bi îradeya xwe û bi zanebûna xwe, têgihîştina xwe çû.

Hûn eleqedarîya gel ya ji bo şîna Hüsniye çawa dinirxînin?

● Bi rastî jî, ez li xwe mikur tēm. Mîn pê nedizani ku gel evqas bi awayekî tēkûz birêxistî ye. Ev serê heftayekê ye rojê bi hezaran insanên me tèn şîna me yan jî şîna xwe. Ez ji xwedê niyaz dikim, ku keda gelê me tewşê de nebe.

Di vî şerî ku bi salan e tē meşandin gelek gerîla û leşkeran jiyana xwe ji dest da. Hûn wekî malbateke xwedan şehîd bi kelegermî diwxazin çi bibêjin?



Hüsniye Oruç di sala 1975'an de li Çinar a Amedê de hate dinê. Hüsniye Oruç (Binevş) Licê ya Amedê çalakiya xwefedayî pêk anî.

● Ji bo ku mirov bersiveke rast bide vê pirsê te, divê berî pêşî ji xwe bipirse: “Gelo ka ez çendî nêzî insanîyetê me?” Ez naxwazim kurmoriyek jî bêyî ecela xwe jiyana xwe ji dest bide. Çi gerîla çi leşker bila neyên kuştin. Ez naxwazim mal û gund jî werin valakirin an jî şewitandin. Lê bivê nevê ev tişt va ye çêdibin. İnsanîyet bi destê insanan hatiye tēkbin. Nexwe ev şer barê li ser milê me ye. Di pevçûnekê de mafdarî heye, çavsorî heye.

Hûn ji bo kesên ku ji ber çalakiya Hüsniye birindar bûne çi dibêjin? Hûn ji van kesan reaksiyoneke çawa hêvî dikin?

● Bi rastî ez ne bawer im ku ev kesên ku ji ber vî çalakiyê birindar bûne, li hemberî malbata me reaksiyoneke nebaş nîşan bidin. Êdî her kes pê dizane ku sebaba vî şerî qirêj sîstem bi xwe ye. Ez ji bo kesên birindar şifayê temenî dikim û hêvî dikim rojek berî rojekê tendirustiya wan baş û tēkûz bibê.

Baş e. Hûn dikarin hinekî behsa Hüsniye û danûstandina wê ya bi mirovan re bikin?

● (Apê wê Mehmed vedibêje) Binevş miroveke gelekî durist û xwedî î-

radeyêke zexm bû. Gelek bi hîs bû ew çend jî xwedî îradeyê pihêt û zexm bû. Gelekî hez ji mêvanan dikir. Wê dil dikir xwarina xwe bi derdora xwe re par bike. Jixwe wisa jî dikir. Berî çûyêna xwe re wê gelek insanên baş nas kirin. Kesên baş û serek. Ew, beriya wî şehîd ketin....!

Piştî çend pirsan peyre me berê xwe da dayika Hüsniye Oruç Dursine û me çend pirs jî ji wê kirin.

Gelo tē bîra te? Hüsniye çawa tevî nav refên gerîla bû?

● Roja yekê avrêla 1994'an bû. Wê bi destê xwe êlegê min li min kir, şîmikên min rast kirin û gote min: “Tu jî zû de yî neçûyî mala xaltîka min!” Piştî ez derdikevim ew û birayê wê yê biçûk diçin dikanê û Binevş jê re topekê dikire û dide rê. Ew roja ku çûbû heya îro em li hêviya xebereke wisa bûn. Jixwe an dê werin kuştin an jî girtin.

Daxwaza we girtin bû an şahadet?


● Weleh min sed carî şahadet dixwest lê girtin na. Lewre car heye insanên ku tene girtin dibin sebaba rûreşiyên mezin û pê re malbata xwe ji rîswa dikin. Va ye wekî Şemo! Ma ev nê rûreşî û riswabûn e?

□ 26-31.12.1991

PKK'ê Kongreya xwe ya 4. pêk anî

PKK'ê kongreya xwe ya çaremîn li Kurdistanê li dar xist. Di kongreyê de rewşa Rojhilata Navîn, kêşeyên ku piştî hilweşîna reel sosyalîzmê rû dane û çareserkirina rêveberîtiya tekoşîna hate nîqaşkirin. Her wiha di kongreyê de li ser perwerdehiya nav gerîla jî sekinîn û biryar stendin. Kongre piştî pênc rojan bi dawî bû.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 31.12. 1994

Hêlîn Başak Kanat jiyanê xwe hundê kir.

Lîstîkvana Teatra Jiyana Nû şanoger Hêlîn Başak Kanat jiyanê xwe ji dest da. Xebatkara NÇM'ê di 31'ê berfanbara 1994' an de li Herekeyê di dema rêwitiyê de di encama êrişekê de jiyanê xwe ji dest da. Kanat, Dêrsimî bû û di 17 saliya xwe da bû.

Înstîtuya Kurdî Şahiya piştgiriya li dar xist

Roja 19'ê berfanbarê Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê şahiyeke piştgiriya bi xwarin li dar xist. Şahiya ku ji der û dorên welatparêz, demokrat û rewşenbîr li dora 500 kes beşdar bû, li Navenda Çanda Mecidiyeköyê hate lidarxistin. Şahiye jî bo şehîdên azadiyê bi rawestîna rêzgirtinê dest pê kir.



Serokê Înstîtuya

Kurdî Hasan Kaya di destpêka şahiye de axaftinek kir.

Kaya di axaftina xwe de li ser jiyana û rewşenbîriya Ehmedê Xanî rawestîya û ji rewşa wî ya li hemberî gel mînak dan. Kaya got: "Xewna Ehmedê Xanî ya ku yekîtiya neteweyî û welatekî azad bû, îro pir nêzik e ku pêk were." Her wiha Kaya li ser pêvajoya Romayê jî rawestîya û wiha got: "Di vê pêvajoyê de firsendeke pir mezin derketiye pêşberî kurdan. Ji serdema Ehmedê Xanî heta roja îro gelek serok û rewşenbîrên kurd bang li kurdan kirine. Banga dawîn jî

Serokatiya Neteweyî dike û divê kurd guh bidine vê bangê û li xwe xwedî derkevin."

Di şahiye de ji danêrên Înstîtuya Kurdî Feqî Huseyn Sağınç jî axaftinek kir. Feqî Huseyn ji helbestên Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî û Cegerxwîn nimûne dan û

wiha domand: "Bi sedan sal e her dem hêzên dagirker li hemberî kurdan astengî derxistine û rê li ber wan girtine. Nehîştine ku kurd bi çand û nasnava xwe bijîn. Ji bo ku kurd ji vê rewşê xelas bibin divê her kurd peywira xwe pêk bîne."

Ji Navenda Çanda Mezopotamyayê Koma Serhildan semah girt û Koma Rojhilat û Teatra Jiyana Nû bi muzîk û şanoyên xwe şahî rengîntir kirin û mêvan coşandin. Her wiha dengbêjekî jî herêma Serhedê jî bi stranên xwe beşdarî şahiye bû.

MÛLAZÎM ÖZCAN


Êrişên li ser HADEP'ê bînavber didomin.

Di vê meha dawîn de hêzên dewletê yê fermî bi desteka hêzên sîvîl li ser HADEP'ê û gelê kurd pest û çewisandinan bi gurehî didomînin. Gelek xebatkar û endamên wê hatin lînkîrin. Hêzên dewletê bi ser gelek navçeyan de girt, çalakiyên demokratîk û aştiyane hatin astengîkirin; bi faşîstan re bi awayekî hovane êriş birin ser HADEP'îyan, bi hezaran kes hatin derdestkirin. Her wiha du kesên ku di greva birçîbûnê de bûn di encama êrişên tund de jiyanê xwe ji dest dan. Piraniya avahiyên HADEP'ê niha di bin dorpêçandinê de ne. Çûn hatina hin navçeyan jî bo gel hatiye qedexekirin. Yek ji wan navçeyan jî HADEP'a Bağcılar e.

Li ser van qewmînan HADEP'a Stenbolê di 21'ê berfanbarê de xwest ku li ber avahiya navçeyê daxuyaniyekê bide çapemeniyê. Lê berî ku çalakî dest pê bike girse bi êrişa polîsan rû bi rû ma. Endamê Lijneya Birêveberîya Navendê Sevahir Bayındır, birêveberên bajêr Halil Sahk, rû ma. Endamê Lijneya Birêveberîya Navendê Sevahir Bayındır, birêveberên bajêr Halil Sahk, Ferhat Yeğîn, Mecit Aygöl, Ali Can Ünlü, Nusrettin Kaplan, Şeyho Demir, Saim Aktürk jî di nav de bi sedan kes bi zordarî hatin girtin. Her wiha HADEP'ê li ser van rûdanan bi daxuyaniyekê ev yek şermezar kir û ji raya giştî pejnkarî xwest.

ÇAVDÊRÎ

Ziman, nivîskar û romana kurdî



SERKAN BRÛSK

Gelo li ser şoreşê dikarin romanên mezin bi zimanê kurdî werin nivîsandin? Zimanê kurdî dikare şoreşê di avahiya romanê de bi laş bike? Ewê di bin barekî wiha de çi qasî karibe rabe? Gelek kes bawer dikin ku zimanê kurdî nikare bersiva vî karî bide. Lewre jî dibêjin bi kîjan zimanî dibe bila bibe ger roman û berhemên mayin yê edebî li ser şoreşê werin nivîsandin, ew divê wek berhemên edebiyata kurdî werin nixandin. Ev dîtîna çiqasî di cih de ye û çiqasî rastîya zimanê kurdî fam kiriye, divê mirov jî xwediyên van îdeayan bipirse. Hemû kesên ku bi zimanê Kurdî kê-m-zêde zanin û pê hinekî danûstandinê bi jiyana re dikin, dizanin ku zimanê kurdî di warê edebî de têra xwe heye. Dibe ku bi zimanê kurdî danûstandin bi jiyana nûjen re zêde çênebûbin. Heta dikare di navbera wê û zimanê îroyîn de ku bûne zimanê ragihandinê çend dehsal ferqa jî hebe, lê dîsa jî, zimanê kurdî bi saya zindîmayîna neteweyî û gelê xwe, dikare vê ferqê di demê kin de bigire. Helbet li vir gotin zimanê teknoloji, ragihandin, zanyarî, derûnî û hwd e.

Lê ger gotin li ser zimanê romana şoreşê be zimanê kurdî têr dike. Li vir ya ku divê were nîqaşkirin nivîskar bi xwe ye. Em divê ji zimanê kurdî zêdetir behsa nekirkêrî yan jî zîrekîtiya nivîskarên romanên bikin. Nivîskarên kurdî hîna ne di wê qewetê de ne ku karibin bi zimanê xwe romana şoreşê binivîsin. Malûm e gelek sebebên vê nekirkêriyê yê dîrokî heye. Lê tevî van faktorên ku rasterast li dijî nivîskar û nivîskariya kurdî in jî ne, îro diviyabû nivîskarekî kurdî bi awayekî pir xurt û konsantrebûyî karê nivîskariyê bibira serî. Li vir kêmasî ya nivîskaran e.

Niha ku mirov li vir navê romannivîsê mezin yê gorbuhiştê Erebb Şemo bide, dê gelek tişt jî ber xwe ve werin zelalkirin. Erebb Şemo gelek roman bi zimanê kurdî nivîsandine. Wek Şivanê Kurd, Jiyana Bextewer, Dimdim û Berbang ev hemû jî bi zimanê kurdî hatine nivîsandin. Hîn di salên 1940-50'an de ew bi vî karî bi baştirîn şeweyî rabûye. Dema mirov Romana Jiyana Bextewer yan jî Dimdimê dixwîne, mirov bi nivîskarên kurdî re tê hemberî hev, ne bi zimanê kurdî re. Erebb li gora dema xwe romanên xwe bi awayekî pir dewlemd dane ber embara zimanê kurdî û ew heta tu bêjî bes, ji zimên dagirtine. Wî, hemû berhemên xwe bi zimanê kurdî xemilandine, bi peyvên kurdî diwarên berhemên xwe bi hesasiyeta hosteyên keviran lê kirine. Bêguman Erebb damezrînerê romana Kurdî ye. Bi romana xwe ya Dimdimê jî, bîngeha romana kurdî ya berxwedanê avêtîye.

Berî niha bi du salan min ev roman cara pêşî xwend û bi carekê re tesîreke pirr mezin li min kiribû. Berî niha bi mehekê carekê din min ew ji bo em li Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê wê munaqesê bikin, xwend. Min dîsa bi heman heyecanê û tamê ew qedand. Yek jî serkeftîntir aliyê vê romanê fikirîkirina bi kurdî û îfadekirina bi zimanê kurdî ye. Termînolojiya siyasî, derûnî, birêveberî, ziraî, evîni, xayintî û hwd baş hatiye vegotin. Erebbê ku di ber zimanê xwe de ked daye, xwe di ber de eşandiye, bi awayekî pir dewlemend jî wê fêde jî ûtiye.

Hejmarek dehsal di ser Erebb re derbas bûn. Ger hîna îro jî çend Romanên wekî Dimdimê nehatibin nivîsandin, ev ne ji qelsiya zimanê me tê, ev qelsî û jariya nivîskarên kurdan e. Çima zimanê têra Erebb gorbuhişt kir, lê çima têra me neke?

Serê salê binê salê

Azadî bibe para vî gelî...!

Sal 1998. Saleke nû dest pê dike. Li Kurdistanê şerek li dar e. Şer ji her sal dikeve qonaxeke nû. Her wiha du aliyên şer hene. Bi destpêka salê re herdu aliyên şer li gorî xwe encamnemeyê salê radigihînin. PKK'ê sala 98'an bi vê dirûsmeyê pêşwazî kir: "Di warê jiyane de azadî, di şer de serkeftin." Di heman demê de, di serê salê de Serokwezîrê Tirkîyê Mesut Yılmaz ji armanca sala nû wiha ragihandin: "Sala 98'an wê bibe sala hiqûqê. Îsal em dê Cezayê Îdamê û Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê rakin." Li aliyê din di 1'ê rêbendanê de li girtîgehan grevên birçîbûnê didomiyên û li Girtîgeha Erziromê

grewa birçîbûnê ya demnediyar di roja xwe ya 46'an de bû. Her wiha di nava salê de ji êrişên li ser girtîyan bêrawesttan pêk hatin.

Kedkaran jî di destpêka salê de digot ku sal wê bi livbazîyan bidome û ev gotina xwe di 17'ê rêbendanê li İzmirê û di 18'ê rêbendanê de ji li Stenbolê, bi sazîkirina mitîng û meşan pêk anî.

Newroza 98'an li Kurdistan û Tirkîyeyê bi coşek mezin hate pîrozîkirin. Lê ji bilî Stenbolê li her derê polîsan êriş birin ser çalaksazan. Gelek kes hatin derdestîkirin û gelek jî birindar bûn. Her wiha pîrozbahîya Yekê Gulanê jî bi vî awayî hate pîrozîkirin û hêzên dewletê jî

bi heman awayî çalaki çewsand û êrişên dijwar pêkanîn.

Di 12.02 1998'an de polîsan avêt ser Navenda Giştî ya HADEP'ê û Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozrak jî di nav de 6 rêveberên HADEP'ê yê navenda giştî derdestîkirin û peyre ew şandin girtîgehê. Bi girtina Murat Bozrak re HADEP'îyan zêdetir piştîgiriya partiya xwe kir. Di dadgeha 28'ê avrêlê de HADEP'îyan ku ji bo temaşekirin û piştîgiriya HADEP'ê çûn Enqereyê, li derveyê Enqereyê hatin astengîkirin û nehiştin bikevin Enqereyê. Di destpêka salê de ev girtina Serokê HADEP'ê û HADEP'îyan jî aliyê derdorên demokratîk ve wekî rûdaneke nexêr hate nixandîn. Lewre biryarên 28'ê Reşemiyê jî bo jînavêrakirina hêzên muxalîf hatibûn hildan. Êdî ne pêwîst bû ku artêş wekî berê bi zorê desthilatdar bibe lewre êdî bi van biryaran çî bixwesta wê siyasetmedar li gorî wê tevbigeriya. Di heman biryaran de doza jî navêrakirina kes û saziyên demokratîk, ku wekî alîgirên PKK'ê dihatin binavkirin jî, di hate kirin.

Çeteyan qesta Akın Birdal kir

Di 12'ê meha gulane de, du kesên xwe wekî serdanên Akın Birdal dane naskirin, li Navenda Komeleya Mafên Mirovan ku li Enqereyê bû, 13 gule berdan laşê Akın Birdal. Ji van guleyan 6 gule di laşê Birdal re çûn û Birdal bi giranî birindar bû. Li ser helwesta der-

dorên demokratîk kujerên Birdal hatin derdestîkirin lê di warê cezalêkirinê de hê jî tu encam nehatiye wergirtin.

Her wiha bînpêkirina mafên mirovan di sala 98'an de jî bi awayekî dijwar û tund domiya. Gelek kes hatin binçavkirin, îşkence li wan hate kirin û hinek jî jê hatin înfazîkirin. Di vî warê de xebatên ku ÎHD dike jî hatin astengîkirin û deriyê şaxên ÎHD'ê hatin morkirin. Hê jî şaxên ÎHD'ê yê Amed, Balikesir, Riha û Mêrdînê girtî ne.

Meşa Mezin

Kurdan li Dortmundê li Parka Westfalenhalenê meşeke mezin çêkir. Di vî meşê de li dora 150 hezar kurd û dostê kurdan beşdarî tê de kirin. Di vî meşê de kurdan daxwaza xwe ya bo aşîtiyê anî ser zimên.

Li dûv vî her çîqas rayedarên Tirkîyeyê digot me PKK di warê şerkirinê de tîk biriyê jî di meha gelawêjê de, gerilayan li Çiyayê Kato û Deriyê Kaç êrişeke mezin û dijwar pêk anî. Di vî çalakiyê de 40 heb leşker hatin kuştin. Her wiha di meha sermawezê de jî gerilayên ARGK'ê li Wanê helikoptereke artêşa tirk anîn xwarê. Cara pêşîn wekî her car serleşkerên artêşa tirk got: "Firoke jî ber arizeyeke teknîkî ketiye" lê peyre li xwe mikur hatin.

Di heman mehê de karkerên ku her sal bo kar diçûn bajarê Orduyê jî aliyê waliyê Orduyê Kemal Yazıcıoğlu ve ketina wan bo Orduyê hate qedexekirin.

Dîsa di 26'ê sermawezê de Berpîrsê Karê Nivîsaran yê Azadiya Welat M. Salih Taşkesen jî aliyê polîsan ve hate desteserîkirin û peyre ew bo Girtîgeha Ümraniyê hate şandin.

Li aliyê din navend û nûnergehên Kovara Özgür Halkê, di tevahiya salê de bêrawesttan ji êrişan para xwe wergirt. Di 19'ê meha adarê de polîsan avêt ser navenda kovarê, xwedî û berpîrsê nûçeyan yê kovarê jî tê de, çar kes hatin derdestîkirin. Di heman êrişê de polîsan dest danî ser arşîva kovarê.

Her wiha di 5'ê sermawezê de polîsan avêt ser navenda kovarê û çar kes bo lêpîrsînê hildan. Wekî din 2 nûnerên kovarê yê Amed û Bursayê di heman mehê de hatin desteserîkirin û dûre ew bo girtîgehê hatin şandin. Ev nûner hê jî di girtîgehê de ne.

Her wekî din polîsan di 5'ê meha sermawezê de avêtin ser Kovara Özgürleşen Yurtsever Gençlik û xebatkarên wê derdestîkirin. Xebatkarê vî kovarê yê İzmirê ku di meha avrêlê de hatibû girtin û dûre wan şandibû girtîgehê, hê jî di Girtîgeha Uşakê de dimîne.

Her wiha rojnameyên wekî Emek, Atilim, Kurtuluş û hwd. yê din jî para xwe ji van êrişan standin.



Êrişên li ser çapemeniya kurd û muxalîf her berdewam bûn

Di 1998'an de êriş li ser çapemeniya kurd û muxalîf kêm nebûn. Belavkirina Rojnameya Ûlkede Gündemê, bi pey derketina xwe bi çend mehan pêşîn bi a-

wayekî fiilî, piştî jî di meha avrêlê de bi bi awayekî fermî li OHAL'ê hate berdestîkirin. Ev qedexekirin heta dema girtina rojnameyê jî domiya. Her wiha jî bilî bûroya Û. Gündemê ya Navendî bûroyên Kurdistanê her gav di bin êrişên dewletê de bûn û nûnerên rojnameyê yê Amed û Êlihê gelek caran hatin derdestîkirin. Li aliyê din Bûroya Û. Gündemê ya Êlihê di 21'ê pûşperê de bi şev jî aliyê hêzên nediyar ve hate bombekirin. Ji ber ku êriş bi şev hate pêkanîn, kesî jiyana xwe ji dest neda. Dîsa nûçegihan, berpîrsiyar û xebatkarên rojnameyê gelek caran bi awayekî neqanûnî hatin derdestîkirin.

Di vî salê de rê li ber firotina rojnameyê jî hate girtin. Ji bilî binçavkirina belavkarên—ku her roj dihatin binçavkirin—di 6'ê meha pûşperê de li BBD (Birleşik Basın Dağıtım)'yê polîsan dest dan ser 12 hezar rojnameyî û nehişt bigihîje ber destê xwendevanên rojnameyê.


Her wiha DGM'ê îsal ji bo

rojnameya Û. Gündemê xebitî. Rojnameya Û. Gündem di vî temenê xwe yê kin de 125 nûçe, 63 nivîsên quncik, 9 wêne û 14 jî îlanên wê jî aliyê DGM'ê ve hatin sansûrîkirin. Ev sansûr hemû li ser nivîs û nûçeyên der barê şerê di navbera PKK'ê û dewleta tirk de hatibûn kirin. Ji ber van nivîsan rojname di 23 meha kewçêrê de bo mehekê, ji aliyê DGM'ê ya Stenbolê ve hate girtin. Berî ku ev ceza bi dawî bibe, weşana rojnameyê carêke din bo sê rojan hate rawestandin.

Welat ji Welêt re qedexe ye

Her çîqas rayedarên Tirkîyeyê li welatên cihanê bibêjin zimanê kurdî ne qedexe ye û li Tirkîyeyê bi navê Azadiya Welat rojnameyêke bi kurdî derdikeve jî lê li aliyê din belavkirina Azadiya Welat bi awayekî fiilî tê berdestîkirin. Her wiha di 19 meha gelawêjê de kesên ku wekî faşîst tînan nasîn, êrişek bir ser Nûnergeha Azadiya Welat ya Mêrsînê û xebatkarê nûnergehê Ekrem Hazar birindar kir. Li aliyê din di 13'yê meha gelawêjê de belavkirina Azadiya Welat bi awayekî fermî bo OHAL'ê hate qedexekirin.





Hincet ji qaşo wan li Behra Reş alikarî bo gerilayan dikir. Daxuyaniya li ser qedexeya ketina bo Ordüyê ji aliyê rojnameya Û.Gündemê ve di 19'ê meha gelawêjê de hate weşandin.

Di heman mehê de çalakiya Dayikên Şemiyê di hefteya 170'î de rê li ber rûniştina wan hate astengkirin. Hê ji destûr nadin Dayikên Şemiyê û serê her hefteyê ew têne binçavkirin.

Xebatên ji bo aştiyê

Îsal jî Komeleya Mafên Mirovan ji bo aştiyê li Sed Hotelê daxuyaniyek bo çapemeniyê ragihand û diyar kir ku wê îsal jî otobûsa aştiyê bo Amedê bi rê bikeve. Li gorî ÎHD'yê wê di 31'ê gelawêjê de otobûsa aştiyê li ber TUYAP'a Stenbolê bi rê bikete û wê di 1'ê rezberê de li Amedê bûya. Di 31'ê gelawêjê de aştiyê li ber TUYAP'a Stenbolê li hev kom bûn lê polîsan êrişî wan kir û nehişt ku aştiyê biçin Amedê.

Di heman demê de , roja 28'ê gelawêjê, Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan beşdarî bernameyê MED-TV'î bû û agirbest ragihand. Agirbestê di yekê rezberê dest pê kir. Bi pey agirbestê diplomasiya kurdan geş bû. Her wiha Parlemantoya Kur-



distanê ya li Derveyi Welat (PKDW) xwe ji nû ve saz kir û hilbijartineke nû pêk anî. Peyre endamên PKDW'ê di roja 29'ê rezberê de li Parlemantoya Îtalyayê sond xwar. Tirkiyeyê her çend lê xebitî ku rê li ber sondxwarinê bigire jî lê doza wê neçû serî.

Li dijî Öcalan komloyek pêk hat

Piştî agirbesta PKK'ê li gorî agahiyên ku Öcalan dan, di 9'ê meha kewçêrê de li dijî wî komployek pêk hatiye. Bi pey agahiyên Öcalan ku ev êriş biçûya serî dê şerê herêmi rû bida. Li gorî plana komployê cihê ku Öcalan lê bûye wê bi moşekan bihata bombekirin. Bi pey ragihandina Öcalan ew wê demê di balafirê de bûye û lewre komploya Tirkiyeyê di avê de çûye. Li gorî wê komployê di heman rojê de, êvara 9'ê kewçêrê di dema panelekê de Tirkiyeyê jî bo rawestandina bernameyên MED-TV'iyê sinyal şandin peyka wê.

Di tekoşinê gelê kurd de yekemîn çalakiya balafir revandinê

Di 15 saliya tekoşina rizgariya gelê kurd de yekem car balafir hate revandin. Erdal Aksu, kurdekî welatparêz bû, bi tena serê xwe roja 29'ê kewçêrê jî bo şermezarkirina polîtikayên Tirkiyeyê yên li ser gelê kurd û kompolaya li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan balafireke THY'yê revand. Erdal Aksu xwest ku balafir biçe Lozanê, ku Kurdistan lê hatibû parçe-

kirin lê Erdal Aksu heman şevê li Balafirgeha Esenboğayê hate kuştin.

Bi çûna bo Romayê ya Öcalan kurd ketin rojeva cihanê

Serokê Giştî yê PKK'ê di 12'ê meha sermawezê de ji Rûsyayê çû Îtalyayê. Bi çûyina Öcalan ya bo Îtalyayê kurdên li derveyî welêt û yên li welêt jî bo dayîna statûya siyasî bo Öcalan çalakîyên xwefedayî û xweşewitandinê pêk anîn. Zêdeyî 60 kesan çalakî pêk anîn û di van çalakîyan de ku li zindanan û li derve çêbûn de zêdeyî bist kesan jiyana xwe ji dest da. Di gel protestoyên Tirkiyeyê û mitîngên kurdan ên ji bo piştgiriya Öcalan, ku li Roma, welatên Ewropayê û Kurdistanê çêbûn de, di 25'ê sermawezê de ji aliyê parêzerên Öcalan û Nûnerê ERNK'ê yê Ewropayê Akif Hasan ve paketa çareseriyê ku Öcalan amade kiribû, daxuyandin. Öcalan di vê pakêtê de daxwaza otonomiyê kir û da zanîn ku ew bo şer jî bo aştiyê jî amade ne.

Ligel van rûdanan li Tirkiyeyê di 98'an de her roj hejmara mirovên betal zêde bû û qeyraneke aborî ya diwar rû da. Her wiha pêgeha çeteyên di nav dewletê de berfirehtir bû û diyar bû ku serokwezîr Mesut Yılmaz û gelek wezîr û mebûsan wekî piştgir û hevkarê çeteyan karûbarê dewletê gerandiye. Li dawîya salê Berpirsiyarê Şaxa Narkotîkê ya Stenbolê Feruh Tankuş da zanîn ku Gerîndeyê Emniyeta Stenbolê Hasan Özdemir jî di nav de gelek kesan ji tilyakfiroşan (uyuşturucu satıcısı) bertil wergirtine û lewma jî ew wekî Gerîndeyê Emniyetê yê Beyoğluyê hatiye peywirdarkirin.

AMADEKAR: CEMİL ANDOK

Sala morkirina Navendên Çandan

Di tevahiya sala 1998'an de jî li ser navendên çandê êrişên dewletê her berdewam kirin. Astengkirina xebatên Navenda Çanda Mezopotamyê, di 14'yê meha rêbendanê de bi girtina şaxa NÇM'ê ya Amedê de dest pê kir. Astengkirina xebatên NÇM'ê bi rênedana konser û turneya Teatra Jiyana Nû dom kir.

Teatra Jiyana Nû di sala 1998'an de bi şanoya 'Komara Dînan/Şermola' bala temaşekaran kişand. Ev lîstik ji bo ku ji aliyê bîneran ve gelekî hate ecibandin, endamên Teatra Jiyana Nû xwest "Komara Dînan" li bajarên cur bi cur pêşkeş bikin. Ji ber vê çendê derketin turneyê. Di turneya ku di meha avrêlê de dest pê kir de, "Komara Dînan" li Mêrsîn, Edeneyê hate pêşkêşkirin lê lîstik li bajarên Amed, Enqere, İzmir, Meletî û Semsûrê bêhincet hatin ber-



bendkirin. Dîsa di Festîval 3' yemîn a Şanoyê de ku li Enqerê di 18-29'ê sermawezê de pêk hat ji aliyê Komîteya Amedekar ve bi daxuyaniyê ne tîr naverok lîstika 'Komara Dînan/Şeromla' ji bernameya festîvalê hate derxistin.


"Bi hev re xwarin xwarin qedexe ye"

Di sala 1998'an de yek ji balkêştirin qedexeyan ji bo NÇM'ê hate rakirin. Berpirsiyarên NÇM'ê ji bo pîrozkirina 8. salvegera saziyê xwest li Salona Labella xwarineke pêşkêşî piştgir û xebatkarê xwe bikin. Bo vê yekê serî li walîfî û emniyetê da lê xwarina NÇM'ê bêhincet hate astengkirin. Li ser vê yekê xebatkarên NÇM'ê daxuyanîyê da: "Di tu zagon û maddeyan tiştêkî bi vî rengî nîn e lê walîfî û emniyeta Stenbolê zagoneke din li zagonan zêde kir. Li gorî vê yekê kes nikare bihev xwarinê bixwe."

Di sala 31'ê tîrmehê de hêzên dewletê avêt ser Şaxa NÇM'ê ya Stenbolê û Salona saziyê ya bo danîşanê hate morkirin. Her wiha şaxa NÇM'ê ya Hewlêrê jî du caran ji aliyê hêzên nediyar ve hate bombekirin û xebatkarekî NÇM'ê jiyana xwe ji dest da.

Êrişên li ser NÇM'ê di mehên din de jî bi awayekî bêrawestan dom kir. Heta niha jî şaxên NÇM'ê yên Amed û Rihayê bi temamî hatin girtin, şaxên Edene, Mêrsîn û Stenbolê jî bêyî salonên danîşan û pêşandanê karûbarê xwe digerin.

Li aliyê din jî bilî NÇM'ê li ser navenda çandî yên din jî êrişên dewletê her berdewam in. Di van êrişan de salona pêşandinê ya Navenda Çanda Alternatîfê hate morkirin û hê jî girtiye. Her wiha Navenda Çandê Medkom jî hate morkirin. Li ser Navenda Çandan ên wekî BEKSAV, MARTI EKİN, TOHUM, STRAN û hwd. jî bêrawestan êriş û çewsandin hatin meşandin.



Xelatgirên Pêşbirka Helbest û Çîrokan a Hüseyin Çelebî diyar bûn:

Wan dilê xwe bo Hüseyin şandibû

Ev şeş sal in ku bi berdeyamî li ser navê şehîdê nemir Hüseyin Çelebî pêşbirka helbest û çîrokan tê lidarxistin. Îsal jî di 5'ê berfanbarê de li bajarê Almaniyayê Munsterê heman çalakî li dar ket. Ev yekemîn pêşbirk e, ku bînavber tê domandin.

Îsal ez di beşa helbestan de wekî jûrî hatibûm hilbijartin.

Dema ez jî bo festîvalê çûbûm Holandayê, li wir hevalan cara pêşîn heştê helbest dabûn min. Min di demeke kin de ew helbest xwendibûn. Dûvre ez fêr bûm ku bi qasî wan helbestan jî, helbest bo min hatine şandin. Min hemû helbest bi baldarî xwendin. Bi rastî jî hemû helbest jî dil û can hatibûn nivîsandin û rastiya jiyane jê difûriya. Bi taybetî helbestên Girtiyên Azadiyê bi peyvên hestgerm û nazenîn hatibûn hûnandin. Dilê xwe jî Hüseyin Çelebî re şandibûn.

Şa çîrokan de jî heman trajediyê rû daye. Hevalê Hesenê Metê bi xemgînî behsa vê trajediyê dikir û digot mixabin ku ev hestên wisa bilind û ev tevgerên wisa dewlemend bi zimanê dagirkeran hatine nivîsandin.

Em divê vê jî bîra nekin ku em tenê bi awayekî fizîkî nehatine dagirkerin. Dagirkeran ziman, kinc, têkilî, jiyana û di dawîya dawî de jî ruhê me dagir kiriye. Helbest, çîrok, roman û bi giştî huner têkiliya wan rasterast bi ruhê me re heye. Bi qasî ku em jî bo azadiya xwe ya fizîkî şer dikin, divê em bi vê derecê di eniya ruhî de bi zimanê xwe têkoşinekê bidin destpêkirin. Ji bo vê yekê zimanê me têra me dike. Ez pir bi rehetî dikarim bibêjim, eniya herî qels a zimên e. Pêşketina gerîla, berxwedana zindaniyan, welatparêziya li welêt û derveyî welêt bi têra xwe bi pêş ketiye. Mixabin mirov di her warê ji-

gelek komên heja yên muzîkê govend digerandin û bi dîmenên jî jiyana gerilayan diçûn serê çiyayên Kurdistanê.

Hêwana ku aheng lê çêdibû bi alên PKK'ê û ERNK'ê hatibû xemilandin.

Dîsa jî bilî xwendekarên kurd, gelek xwendekarên tirk û alman jî hebûn. Têkiliyeke xurt bi ber çavên mirov diket.

Her ku seat derbas dibûn, meraqa xwendekarên jî zêde dibû. Gelek jî wan jî bi helbest û çîrokên xwe beşdarî pêşbirkê bûbûn. Wan dixwest ku gavek beriya gava din encam were ragihandin. Wext teng dibû. Heyecan bi me re jî çêbûbû. Dema pêşkêşkar em endam û jûrî vexwendibûn ser dikê hemû xwende-

me watedar bûn. Mamoste li ber çepikan li ser mikrofonê axivî.

Îro hemû rê diçin Kurdistanê

"Berî her tiştî min silavê İsmail Beşikçi, Leyla Zana û hemû girtiyên li zindanên Tirkiye û Kurdistanê ji we re anîne." Mamoste di dirêjahiya axaftina xwe de wiha peyivî: "Berê hemû rê diçin Romayê lê niha diçin Kurdistanê. Bi hatina Serok a Romayê re gelê kurd destê xwe yê dostaniyê dirêjî gelê tirk kir. Lê rayedarên tirk dibêjin hîn bêtir xwîn, zordarî û kuştin. Li aliyekî destê dostanî û aştîyê û li aliyê din jî destên xwînê. Ev

Dagirkeran ziman, kinc, têkilî, jiyana û di dawîya dawî de jî ruhê me dagir kiriye. Bi qasî ku em jî bo azadiya xwe ya fizîkî şer dikin, divê em bi vê derecê di eniya ruhî de bi zimanê xwe têkoşinekê bidin destpêkirin.

karên li hêwanê bi awayekî baldar li benda me bûn. Piştî axaftineke kurt me encama pêşbirkê diyar kir.

1) **Dibistan**, Ali Şah Yetişen, Girtîgeha Sağmalcılarê.

2) **Düş Devriyesi**, A. Riza. Melek, Girtîgeha Konyayê

3) **Tirs û Hêvî**, Welat Esen, Girtîgeha Konyayê.

Mansiyan jî me da helbesta bi navê "Güneşe Bakar Gözlerin." Xwediyê vê helbestê Halil Özsonmez e û li Swîsreyê dimîne.

Piştî ku xelatgirên helbestê diyar bûn, ên çîrokê jî hatin diyarkirin:

1) **Xêliya Sor**, Harbi Soylu Girtîgeha Bartînê.

2) **Du çîrokên bi tirkî bûn duyemîn**. a) **Topraktan Gelen Hayat**, Hasan Bildirici

b) **Öldüren Diyalog**, Nevzat Güngör, ji Girtîgeha Bartînê

3) **Li Çiyayê Meletuwê nêrî û ...** Mehmed Mihemed, Girtîgeha Bartînê.

Piştî navê berhemên hejariyê xelatê hatin diyarkirin, bavê Hüseyin Çelebî axaftinek kir. Piştî axaftina xwe ya bi hest û şîret xelata Hesen Bildiriciyê ku di beşa novel (roman) an de bûye duyemîn bi destên xwe da wî.

Hasan Bildirici tevî kurtepeyvînekê dest bi xwendina çîroka xwe ya bi zimanê tirkî kir. Hemû mêvanên li hêwanê bêdeng li wî guhdarî dikir. Piştî ku Hasan xwendina çîrokê qedand, pêşkêşkar Doç. Dr. Haluk Gerger vexwend ser dikê. Em hemû li benda wî bûn. Wekî siyasetmedarekî, rewşenbîrekî, mamoste-yekî, înternasyonalîstekî peyvên wî, ji bo

birîneke xedar e di aliyê ronî yê dilê Ewropayê de vedike.

Ji bo ku hûn îro karibin li vir bi awayekî serbilind û dilşa bixwînin, gelek ciwanên di temenê we de bêdudilî bi ser mirinê de çûn. Îro her ciwanekî/e kurd divê mîlîtanek, ronakbîrek, zanyarek û xebatkarek be. Îro hemû rê diçin Kurdistanê. Rojnameyên İtalyayê dibêjin Romayê paytexta Kurdistanê ye, silav ji Romayê re. Îro dilê kurdan li Amedê lê dide, silav li Amedê."

Piştî axaftina Gerger dîsa komên muzîkê cihên xwe girtin. Ez jî bo ku hinek agahî ji birêvebirên ahengê bistînim, çûm cem wan. Ji ber ku şev berdeyam e, ew dilebikin. Dîsa jî ez yekî ji wan peyda dikim:

"Vê pêşbirke di sala 1993'yan de dest pê kir û heta niha jî bînavber berdeyam e. Her sala ku diçe pêgirtin û dilgermî beramberî pêşbirkê çend qat zêdetir dibe. Mînak îsal jî hemû beşên civakê kesane berhemên xwe şandin. Kêmbûna helbest û çîrokên bi kurdî em xemgîn kirine. Em hêvî dikin ku di pêşerojê de hejmara helbest û kurteçîrokên bi kurdî zêde bibe."

Hema hema jî hemû zanîngehên ku xwendekarên kurd li wan hene xwendekar hatine vê ahengê. Hejmara xwendekarên li dora 600'î ye. Ew jî bilî vê çalakîyê heftiyên kurdî li dar dixin, semîneran didin û beşdarî aheng û şevan dibin. Ji bo ku Parlemantoya Ewropa mafê siyasî bide Serokê Giştî yê PKK'ê wan kampanyayeke înzeyan daye destpêkirin. Çalakî bi stranên Koma Amed bi dawî bû.

SERKAN BRÜSK



"Berî ku şehîd bikeve, hînî kurdî bû"

Ez di ahenga xelatwergirtinê de fêr bûm ku şehîdê nemir Hüseyin Çelebî berî ku şehîd bikeve pir hewl daye ku fêrî zimanê dayika xwe bibe û bûye jî. Hevalê Xelîl Xemgîn ev helwesta wî wekî serpêhatiyekê vegot. Dema min ev bîhîst, gelekî kêfxweş bûm. Lê dema mirov ji aliyê zimanê kurdî ve li helbestên ku ji bo Hevalê Hüseyin hatibûn şandin dinihêrî, hejmara wan kêmbû. Tenê ji 173'yan 49 helbest bi zimanê dayika me hatibûn rêstin. Bi rastî mirov pir bi vê diêşiya. Dil dixwest û heta pêwîst bû ku berevajiya vê bûya. Ez fêr bûm ku di be-

yanê de û li her devera em lê dijîn rastî vê qelsiya me tê.

Ez dîsa li pêşbirkê ve gerim. Her tişt jî aliyê xwendekarên ve hatibû amadekirin. Bi rastî wan ahengeke bi hemû aliyên xwe serketî li dar xistibû. Komên muzîkê, axivger, pêşkêşkarî û organîzasyon pir serkeftî bû. Gerîla Yûsif aheng bi stranên xwe vekir. Salon bi coşa xwendekarên ku ji zankoyên Koln, Bonn, Bochum, Berlîn, Stuttgart û hinek zankoyên li bajarên din dihejiya. Xwendekar, bi axaftina nûnerê ERNK'ê, Nejdît Buldan, Doç. Dr. Haluk Gerger li rewşa xwe û welêt fikirîn. Peyre bi stranên Xelîl Xemgîn, Xemgîn Bîrhat, Koma Sefkan ketin nava xeyalên dûvedirêj. Dûvre ligel

Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Izmirê

● 26.12.1998 Şemî

Konferansa bi navê "Dî-sînemaya tirk de lêgerîn" Saet: 18.00

● 27.12.1998 Yekşem

Konsera Koma Agirê Zerdeştî "Garan" Saet: 18.00

● 30.12.1998 Çarşem

Panorama: Iştên ji 98'an mayî

● 31.12.1998 Pêncşem

"Sorsala we piroz be"



Li Navenda YÇKM'ê

● 26.12.1998 Şemî

Konsera Koma Çiya saet: 17.00

● 27.12.1998 Yekşem

Bi ser navê: "Bi hêviya 99 bi lihevçistinê be", Sorsala Alternatîf:

Grup Munzur, Beyhan Aksoy, Şanoya Mas-Kara,

Dîa ji bûyerên 98'an

saet:15.00

Dayika ku bi êgir re dîlan gerand: Xecê Falay

Bila xort xwe neşewitînin

"Dora me ye, bila xort xwe neşewitînin. Em bi kêrî çî tîn, me heta îro çî kiriye? Divê em ji ji bo pêşerojê rê vekin."

Ev gotinên li jor ên dayika 63 salî Xecê Falay (Hatice Falay) in. Dayika Xecê roja 13'ê berfanbarê saet di 17.00'an de li Stenbolê navçeya Güneşliyê di mala xwe de bi tiliyan agir berî bedena xwe da. Lê ji ber ku canê wê neşewitî, xwe ji xanî avête xarê û jiyana xwe ji dest da.

Dayika Xecê ji malbateke berxwedêr û serbilind, ji Mala Eliyê Ünîs e. Mala Eliyê Ünîs di Serhildana Xerza de li hemberî dewleta Romê serî hilda û derkete çiyê. Demêke dirêj berxwedana xwe domand. Lê leşkerê Romê geliyê Xerza di xwîne de hişt. Gelek mirov qir kirin, yên mayî jî nefî kirin.

Ev yek her dem di bîra Dayika Xecê de bû. Di axaftina xwe de her tim berxwedana gelî dianî zimên û pê serfiraz dibû. Dayika Xecê wiha digot: "Malbata me malbateke berxwedêr bû. Lê wan (leşkerên Romê) malbata me qetil kirin. Zar û zêçê me bi zindî binerd kir. Divê heyfa wan bê hilanîn."

Malbata Berxwedanê

Berxwedana Mala Eliyê Ünîs her wişa berxwedanên din di berxwedana îro de dijîn. Her çiqas astengî derkevin jî berxwedan bi yekîtiya gelê kurd didomin. Lê dewleta Romê, wekî berxwedanên berê li dijî serokê berxwedana gelê kurd a îro jî kompoyan pêk tîne. Bi vê pêvajoyê re bi dehan keç û xortên kurd li dijî kompoyê agir berî bedena xwe da û ev yek protesto kir.

Kompoyên dewleta tirk jî, bi çûna Romayê ya Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re lê veşeriyên. Çûyina Öcalan a Romayê di dîroka gelê kurd pêvajoyeke nû da destpêkirin. Ev destpêkeke siyasî ye.

Di nav Ewropayê de jî rojeveke nû dest pê kir. Yekîtiya Ewropayê li hev civiya û biryara lidarxistina konferansa kurd hate girtin.

Heyfa Xortan

Di heman demê de dayika Xecê her tim MED TV'yê temaşe dike. Bi xweşewitandina



Hatice Falay

keç û xortan dilê wê diêse û ji hevjinê xwe Qehreman re dibêje: "Bes e êdî ev keç û xort xwe dişewitînin. Bila pîr û kal xwe bişewitînin. Keç û xort divê şer bikin. Em bi kêrî çî tîn? Divê em tiştinan bikin." Dayika Xecê piştî van gotinên xwe ji bo ku girêdana xwe bo Serokê Neteweyî nişan bide çar rojan kete greva birçibûnê. Lê digot: "Kesekê jî dengê min nebihîst. Divê gelê kurd dengê min bibihîse." Dayika Xecê bi vê armancê hevjinê xwe Qehreman şande nanpêj. Wê di vê navê de fanoreyek û qazaxek li xwe kir. Piştî agir berî bedena xwe da lê agir gur nebû. Lewre jî xwe ji xanî avête xarê û jiyana xwe ji dest da.

Hevjinê wê Qehreman li ser vê wiha dibêje: "Ez hê li ser nanpêj bûm deng ji mala me hat. Min bazda. Ez hatim ber derî, min bala xwe dayê Xecê li erdê ye. Min serê wê rakin. Di kêliya dawî ya berî mirina xwe de bi tenê ev peyv ji devê wê derket: Xaniyê me dişewite. Me ew rakir nexweşxaneyê lê em dereng mabûn."


Malbata Falay rojtira dinê cenazeyê wê bo definkirinê bire gundê Xerza ku li ser Misircêya Sêrtê ye.

Hevjinê dayika Xecê, Qehreman Falay piştî xweşewitandina wê wiha digot: "Xecê miroveke dilgerm û berxwedêr bû. Ew ji malbateke berxwedêr bû. Malbata wê hatibû qetilkin. Jin û zarok bi saxî hatibûn binerdkirin. Yên ku zindî mabûn jî hatibûn sirgûnkirin. Yek ji wan jî Xecê bû. Ew ji bo pîr û kalên kurd bû meşale."

HAYRETTİN ÇELİK

TÎŞK

Kongrey Neteweyî



BEKİR ŞIVANÎ

Eger mirov be mējûy gelî kurd da biçêteewe û eş û azerekanî em mîlete û perş û bilawî bênêteewe berçaw, boy derdekewê ke kirdinewey kurd le jêr yek çêtir da ger karî lê kirdin nehatin nebê, ewa yekê e le kare dijwarekan û erke giranekani newey emroy gelî kurd. Çunke paşmawey dagirkerî serkurtkirdin û hewlî tiwanewe karêkî qûlî le kesayetî mirovî kurd kirdiwe. Parçebûnî niştîmanekî û lêkdabiranî komelayetî û goşkirdin be çend kulturêkê namo be siruştî kurd, karêkî way kirdiwe em geley ême zor be zehmet xo le qerey yekêti bidat û rolekanî çarenûsî xoyan be yekewe girê biden.

Belam emeş be watey ewe nayat ke piştênî lê bikeynewe û çarenûsî xoman bideyne dest rojgar. Belkû tewaw be pêçewanewe, kes gumanî le we niye ke wa kurd lem rojgare da le hemû katê ziyatir pêwîstî be tebayî û yekgirtin heye.

Lem serdeme da ke mirovayetî zor be xêrayî pêş dekewê ber metirsî lenawçûn û tiwanewe û gelî kurdîş le pesî pêşewey gelanî hereşelêkiraw da ye û le rûberêk da deji ke dewrî be tarîkstan tenrawe. Hestkirdin be lêpirsirawî mējûyî palî da be endamanî Perlemanî Kurdistan le Derewey Welat (PKDW) û hendê kesayetî niştîmanperwerî kurdewe ke le salî 1985'we, erkêkî zor gewre û mējûyî bixene esto ke ewîş erkî sazîkirdinî binmîçêk e ke hemû kurd be ciyawazî bir û boçûnewe bitwanin le jêrî da kobinewe.

Komîtey Amadekarî Kongrey Neteweyî ke par hate helbijardin, diway bestinî zincîreyek kobûnewe û dirêjepêdanî karî dîplomasi, em rojane le şarî Bruksel civînekî berfirawanî best. Cêy dax bû ke hendê le hêze karîgeran amade nebûn, eger em amade nebûn û beşdarî nekirdine le doxêkî asayî da tenya carêk hest nekirdin bê be berpirsiyarî, ewa le qonaxêkî girîngî wekû êsta da piley lêpirsirawî ziyad dekat û çendînişaney pirsîyar le dewrî layene beşdar nebûkan dirust dekat.

Belam legel eweş da beşdarî tîr dirêjeyan da be karî xoyan û le beyanî kotayî da dawa dekrê ke le mawey sê mangî dahatû da Kongrey Neteweyî dabimezrê. Gumanî têda niye ke eyekgirtin û tababûnî hêz û layenekanî Kurdistan, gurêkî tîr dedat bekêşe kurd û le ser astî nêwdewletî dost û piştîwanî ziyatirî bo ko dekatewe, encamî eweş le katayî de çareserkirdinî kêşekeman û dabînkirdinî maferewakanî gelî kurd e.

Destana Seyrê û Eliyê Mamed

Ere çaxê Îskanê Gulixanê malikşewitî ye, eşfû hilanî got xirp û li ser kirkirka dilê wî xistiye, mîrata eşfûyê tûj e, mîna şû-jin û derzî ye, qedere du tiliyan di doşekê re avêtiye, xwîn herikî ser kulavê xuristanî ye.

Seyrê li mi imê şiyar bûyiye. Seyrê destê xwe peland, herçar tiliyên Seyrê kete devê birîna eşfûya soranî ye lo lo de lo ax hey lo lo!

Eliyê Mamed ji wî halî de bang kir got: Seyrê dotmamê rabe bimeşe, ji bona xatirê Xwedê bes hêstiran bibarîn ser taqêkê xwe ye binex e. Lê lê kumalê kumalavê kêliya ku ez rûnem, wele Seyrê hersê birayê te li sû-retê dinyaya gewrik li şûna min xweş lê lê Seyrê, ax lê nemayê.

Seyrê bang kir, got: Pismamo bi te re me bi te re, bejna min kevokê bi şewq û bi per e, min digot ez yeke helandî me ji canê te re. Wa kurapo ez nemînim piştî te re ax looo dotmam bi gorî!

Eliyê Mamed ji halî bang kirê, got: Seyrê dotmamê heye, bejna te mîna minare ye, takrihana li nav bexçe ye, ji vir û ha de sû-retê dinyaya gewrik ji min re bêfêde ye hey lê lê lê!

Seyrê gote kurapo ez xortî pak im, ez tu qanûnan qebûl nakim, de piştî Eliyê Mamed kurapê xwe rebenê, ezê zewaca bavan li sû-retê dinyaya gewrik li xwe heram kim, ax lê Seyrê nemayê!

Eliyê Mamed bang kirê got: Seyrê dilê min kerkinî, dinya bû behra bêbinî, nana bi evdalê Xwedê sêlke, sêlke sore hesinî, pêdîkî li ser, yek e li binî, agir bi mala bavê te neketê, pêşberî çavê min disekinî, hey lê lê lê Seyrê nemayê! Seyrê dotmamê li min xafet e. Berfê girte welatê Serhed e, dawa namûsê û xîretê zor û zehmet e, ne ku ew gawir bê li miqabilî çavê min destê xwe bike stûkura te de lê lê Seyrê, ax lê nemayê! Seyrê dotmamê rabe bi lez ke bilezîne, daw û delingan biçikîne, xwe bi konê kirivê min Hiseynê Dobelîng bigihîne. Lê lê dotmamê bihar e, şalûl dixwînin li min mizar e, belkî hema hevî Xwedê ji min û te re bibe star e, wax dotmamê dilê min xemîn e, belkî înselleh destê Qor Silêman biçûk e bila bi hevdu bigihîne, ema ez hevîya xwe ji Xwedê dikim bila heyfa min ji li erdê nemîne lê lê lê Seyrê ax lê dotmam bi gorî!

Seyrê bang kirê got: Pismamo heya bi min wa ye, gotin û galgal bêfêde ye, bejna min zirav e, minare ye, wekî takrihana li nav bexçe ye, wa kurapo çiqas bêjim nebêjim, ji vir û ha de ji min û te re bêfêde ye lo lo de lo ax lo looo pismamo!

Seyrê got Seyrê li min nemayê, li min destê li ber ruwayê, li welatê Hesên û Heyderan xwîniya sê birayê, piştî Elîkê Mamed xwîniya welatê Hesên û Heyderan, ezê xwe bixime qirî û rexbika devê dêrayê, lê lê Seyrê ax lê nemayê!

Seyrê bi çavên serê xwe dît ku kurapê wê zelûl bû, melûl bûyiye, Eliyê Mamed bang kirê got: Seyrê dotmamê de we ye, gotin û galgal bêfêde ye, bi rebê alemê ez pê zanim saet bi saet, kêlî bi kêlî rihê min evdalê Xwedê bi hewa kete çokê min bi xwe ye, çavê min qîm li bejn û bala te, li xeml û xêla te ye hey Seyrê ê êêê!

Cara dudan bang kirî got: Seyrê dotmamê

de we ye, gotin û galgal bêfêde ye, ela bi ela ser kursî heq raserî min û te ye, bi rebê alemê ez pê zanim ku rihê min evdalê Xwedê bi hewa ket, belê kete sepeta min bi xwe ye, çavê min qîm li bejn û bala te li xeml û xêla te ye ey Seyrêêê! Seyrê dotmamê dilê min kerkinî, dinya bû behra bêbinî, agir bi mala bavê te neketê qey li pêşberî çavê min disekinî hey Seyrê ay lêêê! Lê lê Seyrê dotmamê dewe gotin û galgal bêfêde ye, bi rebê alemê ez pê zanim saet bi saet kêlî bi kêlî, daqîqe bi daqîqe rihê min evdalê Xwedê kete qirka min bi xwe ye. De çavkî min girtî yekî bi qîm li bejn û bala te, li xeml û xêla te ye hey lê lê lêêê!

Seyrê bi çavên serê xwe dît ku zelûl bû melûl bûyiye, zenga mirinê avête diranê wî ye, heta bezê çavê bêgarê zer bûye. Seyrê bi çavê serê xwe dît ku pismamê wê Eliyê Mamed, wekî tu pîfkî çirayê mer da hazira, timam bûye eee!

Seyrê lawo berê wî li qubletê edilandiyê, li min kevoka simsipî ezî çî bikim ji te re bêjim mirî ye ax lo lo lo kuramo! Seyrê berê wî li qubletê edilandiyê, daw û deling çikandiyê, ya Elah û ya Xwedê go çik û ji kozê baz dayiye hey lo lo oo! Ewê xwe bi konê kirivê xwe Hiseynê Dobelîng gihandiyê, ji tayîa kon çû çîta kon hilda kete bin kon li aliyê kufletê wî rûniştîye, Hiseynê Dobelîng li ewte ewta kûçikan, li hilme hilmê, li nale nalê şiyar bûyiye. Hat der û fener pêxistiye, meyizandina ku meyizand ku keçîkek li ciyê kufletê wî lê, rûniştîye.

Bang kir got: Bavo dilê min defter e, ev çî gotin û çî xeber e, heke tu ins î, cins î ji taliya kon were de re, bextê min û bavê min ji te re hey lo lo lo!

Qasê wilo got, meyizandina ku meyizand, Seyrê ji dawma xwe de rabû, pê re xumîn kete baqê ser keziya, hat û sê girêk û çar girêk li hûçkê wî dayî ye.

Eman got kirivê de hê ye, ez ketim bextê Xwedê kirivê xwe mêrê çê ye.

Ewî got li vê ecêbê kirivê me Seyrê ye.

Bêje agir bi mala bavê te neketê, tu bi eşqê firîya, wa Seyrê, kirivê bêje xwîne te revandiyê, gelo tu li ser periyê teyran hatiye.

Ewê bang kirê got: Wa kirivê! Got: Libê çî ye!?

Bi rebê alemê got min bi çepî Eliyê Mamed kurapê girt û revandiyê, ez hatim ku xwe li konê kurapê xwe bigirin, bi şaşitî ez ketim bin konê Îskanê Gulixanê malikşewitî ye, Îskanê Gulixanê malikşewitî di mala xwe de li min kir fen û bêbextî ye, kurapê min di ber singa min de kuştiye, îmdada me kirivê min rebê jorî ye, tu min mahr kî li kurkî ji ye xwe, yan tu mahr ke li wî canî ye, eman tu min nede destê wî gawirî ye, lo lo kirivê ax lo lo lo kirivê lo lo!

Ewî bang kir û got: Kirivê bi per e, berbê kirivê min bi şewq û bi per e, ezê pîrskê bikim, bêjim ji kirivê xwe re. Belê tu zanî îro ez ketime zora min çûyiye, îro piraniya mêraniyê biriyê lê sê lawê min hene, du qîzê min hene bi qurban canê te be hey lê lê lê!

Ha di wê kêlî di wê eynê de Îskanê Gulixanê malikşewitî di nava êlê de bi ebrê ketiye, destê xwe daniye şûrê gergênî ye. Dengêkî bang kiriyê ey li vê ecêba giran, çawa ez li ezmanê heftan li Seyra Gulîsor digeriyan, li



halê hazir li erda muqades kete ber van lepiya, min kurapê wê di ber singa wê de kuştîye, ewê ku Seyrê li mala wî derkeve ne xwezîya bi rihê wî ye.

Li wî alî xwe ji paş keçîkê dabû alî ye, Hiseynê Dobelîng li Îskanê Gulixanê kire qîrîn û heyderî ye...

Bang kirê de lawo dilê min xemgînî, meyzê tu vê keçkê bi vê ecelê bibînî, lawo de here qey du saet maye ji sibê re.

Ema lawo ev çî dewr e, çî dewran e, tu dibê bîne ezê vê kêliyê jê re bibim mêvan e, heta sibê emê laşê kurapê wê bigirin, ezê ji te re bêm kêfxweşî ye, ezê vê qîza bişewş û şemal pêşkêşî fesal, bidime destê te, rahije kêrkê, qelem traşkê, li ser laşê kurapê xwe li xwîn, ema neble qisqetê te li tu ciyan lo lo lo Îskano!

Mecîs û heyeta pê re go bi rebê alemê heçê gotine, gotina wî ye, timama destê xwe li depê singa wî da wî vegeandiyê.

Qasê ew ji pey vegeyîya, Hiseynê Dobelîng, li ber hersê lawê xwe gurê gewrik kiriyê. Got: Lawo de he ye, ema lawo ji sê salî heta îro gihandê ber zewacê ye, ez we xwedî dikim bi dîvê beranan ji bo roka wilo ji bo serê we here di oxira xîret û namûsê de hey lo lo! Lawo rabin lez kin bilezînin, îro roja kurê bava ye, bav kalikê xwe bi bîra xwe bînin, bi çembilê Seyra Gulîsor bigirin, bi xuh û biratî li pişt xwe bîdîlînin, hûnê bi neqeba Geliyê Dûdê, Geliyê Simoqê, Geliyê Kersê bi hersê geliyan bigihînin. Ema lawo de hane ewê Hidûde Miarîf zane hey lo lo!

Dêhna xwe bidê, birayê mezin rabû piya, ewî xwe di qayîşê de şidandiyê, bi çembilê Seyra Gulîsor girt bi xuh û biratî li pişt xwe edilandiyê û ketine neqeba Geliyê Dûdê, Geliyê Simoqê, Geliyê Kersê hersê geliya, satek qey mabû ji sibehê re, rabû ji pişt xwe daniye. Got kirivê Seyrê di vir de ji vir û ha de hidûde me dijminê Erebiştan e, oxir û feleka te ê xêrê be ji te re oxir be.

Eman kirivê te diye, tu li Hawingê li Mesilê dizivirî, Konê Omerî ye, bi qasî sed û pêncî konî li dora wî ye hey lê lê kirivê!

Qasê ew ji pişt xwe danî, xatir jê xwest û vegeyîya, Seyrê di cikê xwe de rûnişt, weke gurê serê çîyan, li halê got û got li min Seyrê, li min nemayê, li min destê li ber ruwa ye şermika welatê Hesên û Heyderan, xwîniya hersê birayê bi gurê serê çîyan re gerayê, bi eborê serê çîyan re zûrayê, de piştî Eliyê Mamed pismamê xwe rebenê ezê nemînim li heyata vê dinyayê lê lê Seyrê, lê nemayê!

Kêliya şewqê li sibehê xistiye, meyizan ku şkeftik li wî rexî, derbasî wî aliyê şkeftê bûye,

ji xwe re rûnişt û li halê xwe giriya, kêliya şewqê qenc bi qîmê li mesilê ziviriya, qîsta nav kona kir, meyizandina ku meyizand, ku telîskî li sê-çar darika ye, yek di nav lihêfkê de di bin de razayiya, serî li qûnê fitlandiyê.

Pîrê ji dawma xwe de rabû piya, bang kirê, got: Lawo, ev çî dewr e, çî dewran e, ji xêra paşayê keremê re Xwedê teala li banê banê his kiribana, niha bibûma xortekî çardeh salî, niha minê te li can û cesedê xwe mahr kiriba, lê lê, delê ax hey lê lê!

Lawo bi te re me sed car bi te re, bejna te kevokê bi şewq û per e, sed maseleh ji şewqa te re hey lê lê hey lê hey lê!

Ewê bang kirê, got: Îro yadê bihar e, şalûl dixwînin li min zar e, ji bona Xwedê min divê tu pîra dêka min bî, tu ji min re bibe star a hey lê lê Seyrê!

Vê Sibehê pîrê berê xwe ser vê rêye. Şkeftek raserî Geliyê Kersê, Geliyê Dûdê ye, di deriyê şkeftê de rûnê li halê xwe bêjêye.

Seyrê got: Li min Seyrê li min nemayê, li min destê li ber ruwayê, şermikaya welatê Hesên û Heyderan xwîniya sê birayê, piştî Elîkê Mamed, li pismamê xwe rebenê, xwîniya welatê Hesên û Heydera, ezê xwe bi kur û kem bikim, berdime dinyayê lê lê Seyrê ax lê nemayê!

Şevkê ji şevên Xwedê teala got pîrê dilê min zewitî li vê ecêbê li vê sosretê, li vê kêfê li vê muhbetê, ji bona xatirê Xwedê, meleki yan feqekî we nîn e ku ji min re du qelema bavê ser wê kaxetê hey lê lê hey lê lê heylê!

Pîrê got: Lawo, de heye, melakî wilo heye, destê wî nagire qelemê, awirê wî nabire ji kaxetê ye, lawo tu dixwazî ezê çime pey, bira bê hey lê lê lê Seyrê! Pîrê ji dawma xwe de rabû piya, bi nava êlê ketiya, çû mala melê, ev gotin û galgal jê re gotiya.

Got: Seyda payiz e xwas payiz e, bilbil dixwîne bi dengêkî zîz e, mêvankî me heye çî cimrî ye, ezîz e, min divê tu du qelema bavê ser wê kaxizê nivîse.

Mele got: Pîrê de heye, tu henekê xwe bi bavê melê dike ye, tu zane destê min nagire qelemê, awirê min nabire ji kaxetê ye, eyb e ji bavê te re, tu hatiya ba pepûkê melê, tu dibêje bila bê hey lê lê hey lê hey lê.

Pîrê bang kir, got: Seyda dilê min tetik e, bi Xwedê mêvana min qîzik e, zêkî sorî bi Mehmûdî bi nitik e, Seyda dehê ye navê wê jê re dibêjin Seyrê ye, tiştê hatiye serê wê kevokê wê nazikê, Xwedê teala neanî serê heyvê kurmxwarî li darê dinyê ye. (Dê bidome)

BERHEVKAR: EVÎN RONÎ

Dîwana Feqiyê Teyran

Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi berhemên xwe yên nû karê dewlemendkirina pirtûkxaneyê kurdan didomîne. Berhema dawîn a ku ji hêla Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatiye weşandin, Dîwan Feqiyê Teyran a bi navê "Ey avê av" e. Li bakurê welêt ev yekemîn car e ku dîwana Feqiyê Teyran tê çapkirin. Ev berhema ku li başûrê Kurdistanê bi amadekariya Ebdulreşîb Yûsiv bi tipên erebî hatibû çapandin, ji hêla du endamên Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê M. Reşîb Irgat û M. Îsmet Kılıçaslan ve li tipên latînî hatine wergerandin. Di nava pirtûkê de digel pêşgotina çapa bi tipên erebî ku tê de li ser jînenîgariya Feqiyê Teyran agahiyên tertîjî hene, pêşeka Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî cih girtiye. Di vê pêşekê de jî bi zimanekî wêjeyî li ser girîngiya berhemê û jiyana Feqiyê Teyran hatiye rawestandî. Di nava dîwanê de 13 helbestên Feqiyê Teyran cih girtine. Di dawîya dîwanê de jî ravekirina hinek peyvan ango ferhengokê cih girtiye.

Di dawîya vê nirxandinê de divê bê gotin ku hinek kêmasiyên rastnivîsî û

rêzimanî dema tipguheziyê de derketine holê. Wekî nimûne mirov dikare ji helbesta yekemîn "ey avê av" mînakê bide. Di vê helbestê de hemû cînavkên pirsiyarî "kê" bûna "kî". Tê zanîn ku "kê" cihê navdêrên tewandî, "kî" jî cihê yê xwerû digire. Lê li hinek herêman ev rêpîvan tîk çûye, xuya ye ku tipguhezî ji van herêman yekê ne.

SERWÎSA ÇANDÊ

DÎWANA Feqiyê Teyran

ey avê av



Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

Çanda warê talankirî

Van rojên dawîn pirtûkek gihîşt ber destê me. Li ser pirtûkê mohra girtîgehê ya bi rengê "hatiye dîtin" hebû. Pirtûk ji Girtîgeha Bursayê hatibû şandin, lê li Stockholmê hatibû çapkirin. Abas Alkan tiştên zargotinî yên ku berhev kiribûn, gihandibûn ber destê berpirsên Weşanxaneyê Pencînarê û wan jî di sala 1997'an de ew tişt çap kiribûn. Tevî ku di ser çapkirina wê pirtûkê re nêzî du salan derbas bûbû jî, haya me jê nebûbû. Weşanxaneyê ev berhem ji me re neşandibû, lê nivîskar ew peywir ji girtîgehê pêk anibû. Pirtûk bi gotinên Îsmail Beşikçi yên li ser girîngiya zimanê kurdî dest pê dike. Piştî gotina weşanxaneyê tê, berpirsê weşanxaneyê navborî balê dikişîne ser pêwîstiya berhevkirina berhemên zargotinî û dide zanîn ku rewş û mercên ku mirov tê de ye divê li pêşîya xebatê nebe asteng. Di vî warê de jî ew rewşa Abbas Alkan wekî mînak nîşan dide û bi bîr dixê ku ew dilekî azad e. Beşên peşani yên pirtûkê bi pêşgotina nivîskarî diqede. Nivîskar jî dewlemendiya zargotina kurdî û kambaxiya rewşa kurdan dide ber hev û dide zanîn ku dewlemendiya zargotina kurdan ew li ser piyan hiştine.

Abbas Alkan geşedana çirok û metelokan jî bi geşbûna jiyana civakî ve girêdide û dibêje: "...bav û kalên me jî ber zulma şah û padişahan, ya kolonyalist û metingehkaran daxwaz û armancên xwe bi awayekî neanîne zimên ji ber vê yekê ew rewşa ya xwe civakî kirine çirok..." Alkan, li ser girîngiya

ÇANDA WARÊ TALANKIRÎ




xwedîderketina li zimanê neteweyî jî radiweste û dibêje: "Ez di vê baweriyê de me ku ev jî parek ji Şerê Rizgariya Neteweyê Kurd e."

Pirtûk jî sê beşan pêk tê. Di beşa yekemîn de tiştên zargotinî yên mîna mamikên zarokan ên dema listikan, dûrika berbûyan, sersalê û zûgotin hene. Di beşa duyemîn de tiştên cih digirin û di beşa sêyemîn de çend çirokên lawiran bi awayekî manzûm hatine rastin. Pirtûk, bi taybetî jî bo zarokan gelekî sûdewer e. Her wiha jî bo mezinên ku dixwazin çêja zargotinê bi bîr binin û li zaroktiya xwe vegevin jî hêjayî xwendinê ye.

SERWÎSA ÇANDÊ

Partiya Çep a Swêdê û HADEP

OSMAN ÖZÇELİK



Heta ku min navê birêz Şerefexan Cizîrî nabihîstibû min Partiya Çep a Swêdê nas nedikir. Wê di bîra xwendevanên baldar de be ku di nivîsa min a li ser rehmetî Tewfîq Sincar de navê birêz Cizîrî derbas dibû. Cizîrî kurê pismamê gorbihuşt Tewfîq Sincar e.

Di nava kurdên koçberên Ewrûpa de gelek kesên bi serketî hene. Kurdên ku xwe bi Ewrûpiyan dane qebûl kirin ji tirkan qat be qat zehfîr in. Cizîrî jî wan kesan yek e ku di demek kurt de, li Swêdê di nav Partiya Çep (ku partiyeke heştê salî ye) de gihîştîye heta rêveberiya navendî û li ser navê vê partiyê, li navçeyek mezin a Stokholmê ev serê 12 salan e ku serokatiya belediyyê dike.

Partiya Çep a Swêdê, ji bo kêşeya kurd û bi taybetî jiyana kurdên Bakur ji nêzîk ve nas bike û bi HADEP'ê re têkiliyên siyasî li dar bixe heyetek bi rê kir. Heyet di pêvajoyeke

dijwar de gihîşt ba me. Destpêka "Pêvajoya Roma" yê bû. Îtalyan li dijberî daxwaza Tirkiye, Serokê PKK'ê mîna mêvanekî heja diezimand. Li ser vê helwestê, dewleta tirk dîn bûbû. Li aliyekê li dijî Îtalyayê xwepêşandanên nijadperest li dar diketin, li aliyê din jî êrîş dianîn ser rêveberî û avahiyan HADEP'ê. Serokê Giştî yê HADEP'ê birêz Murat Bozlak û bi sedan HADEP'î hatibûn girtin. 3200 kes hatibûn binçavkirin û îşkencekirin. Li Amedê polîsan bi lêdanê endamê Koma Ciwanên HADEP'ê Hamit Çakır kuştibû. Li Kocaeliyê jî polîsan, endamê HADEP'ê mamosteyê teqawîdbûyî Metin Yurtsever dabû nav destê faşîstan sivil û M. Yurtsever bi lêdanê şehîd ketibû. Bi dehan kes birîndar bûbûn û îşkenceyê berdewam dikir. Terora dewletê careke din li kurdan xistibû. Vê carê bayê terorîzma dewleta tirk xwe gihandibû Îtalyayê jî. Li sikakan mandalîn û porteqalên ku ji Îtalyayê kiribûn, dihatin perçiqandin û "al" a Îtalyayê dihatê şewitandin. Nijadperestên harbûyî dizûriyan û digotin: "Emê Romayê bişewitînin..."

Sekreterê Têkiliyên Navneteweyî yê Partiya Çep a Swêdê birêz Örfan Svedberg, gava ew tişt didîtin an dibihîstin, çavên wî yên di rengê ava Behra Spî de ecêbmayî vedibûn.

Piştî ku Cihan Sincar (xwişka Şerefexan Cizîrî) û hevalên din ên endamê Meclîsa Partiyê (HADEP) ji binçavkirinê azad bûn û hatin îşkenceyên ku li bajarê Amedê li wan hatin kirin, anîn ser zimên, siya ewrên xemgîniyê rûyê mêvanên me yên Swêdî tarî kir. Gava behsa îşkenceyên ku li zarokên 15-16 salî, pîrejînen 70 salî û jinên kurd ên ciwan û yên ducanî bûne dibû, berpirsiyara ciwanên Partiya Çep a Swêdê, ciwankeça Asa Brunius mîna ku li filmekî Alfred Hitcock yê tirsnak mêze bike bi xof guhdarî dikir.

Piştî ku mêvanên me çavdêriyên xwe yên li Amed û Mêrdînê qedandin û vegeviyan Enqereyê, me biryara greva birçîbûnê dabû. Me yê sê rojan xwe birçî bihişt ku raya giştî bi kirinên dewletê bihesiya. Bi civîneke çapemeniyê me û mêvanan me dîtin û ramanên xwe daxuyand. Mêvanên me got: "Me bi rewşa kurdan û ya HADEP'ê dizanî, lê belê edî her tişt li ber çavên me zelaltir e. Û emê li ser herê piştigiriya we bikin." Me biratî û dostiya HADEP'ê û ya Partiya Çep îlan kir. Dost û birayên me vegeviyan çûn Swêdê. Em jî li greva birçîbûnê rûniştin. Di sê rojên greva birçîbûnê de ji 500 kesan behtir HADEP'î jî nû ve hatin binçavkirin. Jiyan û berxwedan berdewam e.

Protokola bo Xwedê

Li ser berga Azadiya Welat a hej-
mara 150'yê wênayê Serokê Giştî
yê PKK'ê Abdullah Öcalan hebû.
Dema ev hejmar rojnameyê li herê-
man tê belavkirin û belavkarên
Azadiya Welat çav pê dikevin, kêfa
wan tê û li ser vê bi kêf rojnameyê
belav dikin. Demekê li dûv hinek
belavkirinê du heb belavkarên roj-
nameyê li ber dîwarekî rûdînen û ji
tûrikê xwe rojnameyê derdixin û (her
çiqas nizanibin baş bixwînin jî) hêdî
hêdî dixwînin. Di wê demê de dinihêrin
nepoxfiroşek (balonfiroş) di wir re der-
bas dibe. Bangê dikin û jê sê heb
nepoxan dikirin. Rojnameyekê bi hersê
nepoxan ve dikin û bi hewa dixin. Gava
gel wan dibîne û dipirse:

-We çima ew rojname beredayî bi
hewa xist?

Belavkarê rojnameyê bersivê didin:
-Em vê rojnameyê protokol dişînin
ba Xwedê. bila ew jî pê bizanibe ku em
zû bi zû dev ji doza xwe bernadin û bila
ew jî ji xwe re rojnameyê bixwîne!

*Xwedê zane tu mirovekî
derewîn î*

Endamekî HADEP'ê her dem dema
ku tê mal propogandaya partiyê dike û
dibêje: "Heyran bi Xwedê em kurd in û
kesê ku ji ber kurdîtiya xwe bitirse û
fedî bike, ew kes ne mirov e ne dîn û ne
jî îmana wî heye." Zarokên wî jî guh-
dariya bavê xwe dikin û bi vî awayî hez
ji kurdîtiya xwe dikin.

Dema wexta dibistanê tê, bavê wan,
zarokan dibê li dibistanê qeyd dike û
zarok jî kêfa wan tê dibêjin qey ew
diçin dibistana kurdî. Bi çûna dibistanê
xeyalên zarokan bi avê de diçin, lewre
mamoste bi zarokan re bi tirkî diaxive.
Tew ev jî ne bes e marşên xwe bi
zarokan dide xwendin. Zarok tîc cîm
bavê xwe û jê re dibêjin:

- Bavo Xwedê dizane tu mirovekî
derewîn î!

- Çima?

- Te digot "Kurd, Kurdistan, têkoşin
û hwd." û tu çuyî, te em şandin dibis-
tana tirkî! Tew ev jî ne be se wele
marşên xwe jî bi me dane xwendin.

- Nebe, nebe we guhdarî li marşê
wan kiribe ha!

- Ma qey tu dîn î ku em li marşa
wan guhdariyê bikin. Dema mamoste

marş dixwend me jî
lingekî xwe
rakiribû.


*Ew der roj baş
NÇM ye?*

Mirovek zarokên
xwe li NÇM'ê qeyd
dike, ji ber vê yekê
her ku keça xwe
dişîne, dû re telefon
dike, dipirse ka
gihîştîyê saziyê an
na. Ber bi êvarê jî
dîsa telefon dike,
dibêje: "Gelo keça
min hê
venegeriyaye malê,
xêr e, çi ye?" Bi vî
awayî hefteyek her
serê sibê û her êvarê
telefon dike. Her ku
telefon dike sekretera ku li ser her gav
dibêje: "Roj baş NÇM e."

Zilam dîsa carekê keça xwe dişîne
NÇM'ê û dûre telefon dike. Hê
sekretera li hemberî wî deng nekiriye.

zilam dibêje: "Elo! ew der Rojbaş
NÇM'e ye?" Sekretera li ser telefonê
matmayî dimîne. Dibêje: "Belê, belê ev
der rojbaş NÇM ye!"

BERHEVKAR: FATİH BENDEWAR



BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (152) XAÇEPIRSA

A	K	F	H	A	S	A	N	R	A
A	N	A	M	S	I	N	B		
I	N	A	R	I	S	E	A	Y	
E	K	A	B	L	E	T	O	R	A
S	G	S	A	E	Z	E	R	E	
I	R	B	E	A	N	A			
I	C	A	X	I					
L	B	M	I	N	B	E			

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsa 150'yê

Xaçepirsa me bi xelat e.
Di 15 rojan de çî bersiv
bigihêjin ber destê me, em de
wan binixînin û bi riya pişkê
li 5 kesan belav bikin. Xelata
hejmarê me ya 150'an, Kasete
Mihemed Şêxo 'Ay lê gulê' ye


mihemed şêxo
ay lê gulê



Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nir-
xandin, divê hûn "Peyva
Veşarî" di nava qutiyên li
bin xaçepirsê de binivîsin û
tevi navîşana xwe ji me re
bişînin.

Pênc kesên ku xelata 150'an Kasete Mihemed Şêxo
'Nesrîn' qezenç kirine ev in: S. Çandevan/Eqere, Mehmet
Başboğa/Mêrdîn, Abbas Çelik/Dilok, Bereket Ağdaş/
Mêrdîn, İmam Tümen/Semsûr.

Zafer Şairekî kurd wêne	Xwelî Bi diqet	Bi farisi- av Namûs	Rêxistma ispanyoli Xweserî	Tehlîl Hazîr	Hizûr berepaşkî
			4		
Navekî mêran			Damar Tîpa dî Iye		2
Ceçn-îm	3	Navekî jînan Ben berpaşkî		Ale Tîpa dî d'yê	
Daçek			Ado wênekesê kî kurd		
Felaket					
			Qeymax Giya	Endam bi kirdkî Cûreyekî tevizinê	
Plaka tirkiyeyê		Tîpa çar an Dengdarê n'iv'	Gelo Dar		
Daçekek					
	Seyd Rojek				
Danekî rojê Sembola oksijenê				Sembola iyotê	
	Tîpa dî m'yê	Eşq. sewda			



PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4

Rihê neteweyî awa kerdiş

Wext o ke welat bindest bo, lazim o ke o millet jî qandê reyayîşê xo bi zerî ra bigirweyo. Ay ra tepiya jî raşt ra raşt mijaran sero fikrê xo raşt vajo. Ze ke yeno vatiş kewtiş jî weriştîşê jî jû millet rehet niyo. Beno ke milletê ma miyan de rihê neteweyî awakerdiş jî xeyle zahmet bo. Bêziwan, bêwelat jî no girwe hend rehet nêbeno.

Her vatişê ma de, bi rastî kes xeyle zahmet vînenê. Kes wexto ke tay meselan sero wazeno vîndero, bêguman ê meselan jî qandê famkerdişî û qandê peymitişî jî û tay peymitişî jî ma danê xo çiman ver. Nê meselê ke ma kurdan miyan de estê. Beno ke ma mileta xo rind û weş nêsilasnenê. Lazim o ke kes mileta xo rind bisilasno. Ma do tay peymitişan jî xo vernê. Di kesayetiye ma de, rihê xulambiyayîşî ca giroto. Na xulamey ma rê kotî ra amê bi.

Bi raştî zeriya kesî nê rewşî rê veşena. Rihê neteweyî ma yê senî awa bi kerê. Çi ke peynî de ma rê rihê neteweyî lazim o. Hema kiştan ra jî ma yê qandê mileta xo girweyênê. Kes wexto ke ewneno çosmê xo ra, bi raştî kes xeyle jî beno xemgîn. Şaxsiyetê ma zehf nêweş o. Lazim o ke ma nê mijaran sero herayêr vînderê û bivîne ke mardim nê rihê nêweşî senî rindêr bikerê. Ewro mileta ma ya senî xo bireyno. Di her wext de mardim kewnê tayn xefletan miyan û ê xefletan sero jî nîno xo ser.

Ca de ronîştîşa şoreş nêbeno

Wexto ke mardim tayn mijaran sero sereyê xo tewnenê, o wext wazeno ke, raya reyayîş û azadey xo verno. Rewşê kesî bi xo nîno vurnayîş. Qandê vurnayîşî jî bêguman rewşê miletî zehf girîng o. Kes ca de

xo de ronîştîşa nêşeno şoreş virazo.

Di xulameya ma kurdan de, ma ney zahf rind vînenê ke çewteyan sera jî ma xeyle bi çiyê vengana meşxûl ê. No, rewş kotî ra yeno. Bi raştî wexto ke tayn mijaran sero zanyayîşê kesî çinêbo, o wext xo eciznayîş jî çewt beno. Ê çewtan sero jî ma tim û tim pê rê egîdey kerd. Rihê ma, mezgê ma, kesayetiye ma, dişmenan dirfê ci viraşt. Eke çiyê ke dijmen bido kesî bêguman o kesayetiya ke ma wazenê zey ma nêbeno. Di heme (hemû) karanê ma de jî, ma ney vînenê ke ma çiyê raştî ra kewnê dûrî. Di hemû kiştan ra ma kemiyê, no kemîbiyayîşê ma kotî ra yeno rojevê ma. Lazim o ke ma mijaranê xo sero rindêr û veşêr vînderê. Lazim niyo ke kes çiyê raştî sero jî nêvîndero. Peymitişanê nûjenî sero jî kes xeyle şaş beno. Rihê neteweyî de, ma ney vînenê ke qandê azadey, rizgareya mileta xo jî tim û tim xebitêno. Bazîl Nikîtin qandê ma kurdan wina vano: "Nemaze, zahf lezeyox, pir wext raşt ameyîş, hata goş ra gege pir kerdiş, hukiman dayîş kiştê ke jî giştî misayeyî". (R. 127) Beno ke ma jî Bazîl Nikîtinî ra tayn dersî vejî. Hema kiştan ra kemîbiyayîşê ma yeno rojevê ma. Di kurdan miyan de, rihê neteweyî zahf zeyif o. Wext o ke kes ewneno çosmê xo ra di dinya de çend miletî estê û kes xo ra şermayeno.



Hidûdê sebrî hetanî cayê yo

Her roja ke şino qandê ma zirar beno. Ewro ma qandê mileta xo se kerd? Lazim o ke welatê ma de, mileta ma miyan de jî fikrê neteweyî, rihê neteweyî bêro awakerdiş û no rih di seranserê welatê ma de jî no fikir bêro nîqaşkerden û ma xo no hal ra bireynê.

Çend serî yo miletê ma di zehmetan miyan de jiyane xo ramena. Di her merdimî de hidûdê sebrî esto. Lewra, milata ma jî di xebatê xo de tayn bo jî tecrûbe giroto. Nê, tecrûban sero jî kemî vêşî her kes wazeno ke bi zahf bo. Ewro ma hêvî kenê û qandê reyayîşî, serberzeyaya mileta xo û di qelpey de, di zexzeyê de çiyê çinyo. Di heme cayan de jî ma ney rind û weş vînenê ke di xebatê milet biyayîşî de fedakarî lazim o. Bêfedakarî ma nêşenê reyayîşê mileta xo biyarê rojevê cihanî. Di cihan de jî no esto ke, kes di welatê xo de jî wayirê îfbarî bo.

Qandê netewebiyayin fedakarî lazim o

Dişmenanê ma çosmeyê ma giroto. Ewro çewtiyê ke, di ma nûyan de, dijmenanê ma înan zahf rind zano. Coka jew biyayîşê mileta kurdî nêwazenê. Nê, zaliman, di seranserê welatê ma de, nê dubendiyan hîmê ci aşanayo. Dişmenê zahf bêbext o. Lomeyê ma dişmenan ra nîno. Ma do pê miyan de hîmê biratey zexm kerê. Di peyniya hemî girwe de, kes wayirê ked û ariqê xo yo. Lazim o ke ma rihê neteweyî û qandê miletbiyayîşî fedakarî bikerê.

Wext o ke welat bindest bo, lazim o ke a millet jî qandê reyayîşê xo bi zerî ra bigirweyo. Ay ra tepiya jî raşt ra raşt mijaran sero fikrê xo raşt vajo. Ewro cihan de hend miletî estê. Qandê rihê neteweyî awakerdişî jî no esto ke, zîwanê xo, mileta xo, welatê xo rê wayirê bivejiyo. Di miletê ma miyan de jî zahf persgirêkî jî estê. Wexto ke kes tayn mijaran sero wazeno vind ro, tayn astengî yenê ma ver. Di nê astengan de hewna miletê ma nîyameyo xo ser. Ze ke yeno vatiş kewtiş jî weriştîşê jî jû millet jî rehet niyo. Beno ke di mileta ma miyan de rihê neteweyî awa kerdiş jî xeyle zahmet bo. Bêziwan, bêmilet û bêwelat jî no girwe

hend rehet nêbeno. Ma destan ra çiçî yeno? Lazim o ke ma jî ey bikerê. Di peynî de jî merdimê rê heveyê jî estinê zanayîşî lazim o.

Azadî û reyayin dewlemendîna dest nêkewna


Mileta ma miyan de dewlemendî (zengînî) estê. Dewlemendê ma bi peranê xo ya nêşenê azadî û reyayin biyarê welatî. Di rihê neteweyî de no esto ke kes qandê welatê xo, qandê mileta xo jî xebatê xo dest ra nêverdo. Ewro kes di heme kiştan ra nêşeno wayirê zanayîşî bo. Di welatê ma de rewşê ma zahf xirab biyo. Kes nê sebebên sero jî wext o ke wazeno vîndero bi raştî kes xeyle zahmetî jî vînenê. Mezgê ma kiştan ra yeno dirfkerdiş û ey ra tepiya heme çiyê ma beno zey dijmenî. Di cihan de reyayîşî milatan, ma rê jî peymitiş o.

Gil û gazincana derd û kulanê rê çare nêvînyeno

Di peymitişanê nûjen de no esto ke her kes merdimo Lewra no esto ke kes bi çiçî ya beno millet û rihê miletî çiçîyo? Di her mijarî de rewşê ma yê ewroyin ney ano ma vero ke, zor û zahmet jî bi xo ya pêşkêşî ma kenê. Bi gilî û gazincana kes nêşeno ke derd û kulanê xo rê çare bivîno. Di mezganê mileta kurdî de bandorê şarî jî ma sero xeyle gird o. Ma do nê bandorî (tesîrî) û nê asimilasyonî ra senî xo bireynê. Lazim o ke ma mileta kurdî rindêr û veşêr bisilasnê. Ey ra tepiya qandê rihê neteweyî awa kerdiş jî o yo rehet bo.

Bes, betaley û teraley rê, ney ra tepiya qandê kesayetiya kurdî babet babet nêbo. Azadey, reyayîş, zey pê û biratey di welatê ma de, hîmê ci ma zexm bikerê. Di peymitişanê nûjen de, xulameyê rê jî ca çinyo. Qandê rihê neteweyî beno ke ma kemî jî vatî. Kes wext o ke na raya azadey û rizgarey dano xo ver jî, bi raştay o wext jî xeyle zahmetî vînenê. Ewro vengê miletê ma jî nê zahmetan ra tepiya qezençkerdiş jî nezdi yo. Di cihan de heme miletan vengê ma aşnawito. Hewna jî o yo bieşnawo. Reyayîşê mileta ma jî nezdi yo.

FERÎDÛNÊ GULÎSTANÎ



Veysi Köklü
(Reşo, Dilnêr)

Li ser navê hevalên wî Evîn Ronî, Emîn Köklü

Hevalê Veysî di sala 1994'an de tevî refên gerîla bû. Di Avrêla 1996'an de di navbera Pasûr û Licê ya Amedê de ket nava refên şehîdan.

Riya wî rêya me ye

WELAT

■ Xwedî (Imtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)

245 16 50 – 251 79 37 – 251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMI TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

■ NİVİSGEHÊN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)

■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmir
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78

■ Munchen:
(Nûnerê Giştî yê Ewropayê)

Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29

Fax: 49 871 670 815

■ Swisre:
İhsan Kurt

Tel-fax
41 21 652 76 07

■ Hollanda:

S. A. Fewzi

Tel-Fax: 31 10 48 555 43

■ Suriye:

Jana Seyda

Helim Yüsiy

Ji kurdê Kafkasyayê Vîyolînjen Karîn Xapayêv

Min divê bi muzîkê cihanê bidim hez kirin

Di nav kurdan de hunermendên jin gelek kêr in. Yek ji wan jî, bestekara kurd Karîn Xapayêv e. Me li ser hunera kurdî, dijwari û zorîyên hunermendên jin bi Karîn Xapayêv re hevpeyvînek çêkir.

Hunermend Karîn, em pir kêfxweş in ku hûn wekî jineke kurd xebata muzîkê dikin. Gelo Karîn Xapayêv kî ye?

→ Ez li Tiflîsê (Gürcistan) ji dayik bûme û li Gürcistanê mezin bûm. Min xwendina xwe bi zimanê rûsî kiriyê. Xebata min li ser muzîkê ji dibistana muzîkê ya normal dest pê kir, piştê ez çûme xwendina konserwatuarê. Min ew şaxê muzîkê xelas kir û di orkestrayê de xebitîm. Li

Karîn Xapayêv ji kurdên "Sovyetistanê" ye. Wê, li ser vîyolînê perwerdehiya bilind wergirtiye û anîha di nava AÇHK'ê de karê vîyolînjeniyê digerin. Karîn, bi hêz û bîngeha muzîka kurdî bawer e û dil heye motîfên rojavayî li muzîka kurdewarî bîne.

rex çalakiyên bi vî rengî, ez mamostatiyê ji dikim. Li Tiflîsê xwendekarên min hebûn û min darsa keman û vîyolînê (kemana biçûk) dida wan, piştê ez hatim Ewropayê. Min nekarîbû xwendina xwe berdewam bikira. Lê bêhtir bi pratîk û bi serê xwe min xebata xwe domand. Min programên nû ji bo vîyolînê hildan.

Çi xebat û projeyên te yê nû hene?

→ Wekî min got, li ser vîyolînê min programên nû hildane. Ez dixwazim di demê kurt de konserta solo ji bo gelê xwe pêşkêş bikim. Programa min nîv hazir e û ez bawer im di demê kurt de ez dê ji bo konsêrê amade bibim.

Hûn dê konserê li ku derê pêşkêş bikin?

→ Di televîzyona neteweya kurd Med TV de. Ew çavê hemû kurdên cihanê ye, dengê hemû civaka kurd digihîne Kurdistanê. Ez pir şanaziye bi Med TV'yê dikim. Ger Med TV tuneba, ev qas mirov wê çawa li dora hev kom

bibûna? Ez ji bo pêşkêşkirina vê programê bi şev û roj dixebitîm.

Karîn tu bi muzîkê dixwazî ji bo neteweya xwe çî bikî? Zimanê muzîkê çî ye?

→ Zimanê muzîkê, zimanekî cihanî ye. Ez ne tenê ji bo kurdan, dixwazim bi zimanê muzîkê cihanê bi her kesî bidime hez kirin. Dîsa min dil heye cihanê bi halê me kurdan bihesînim, kul, kovan û reşerojîyên neteweya xwe bi muzîkê bi gelên cihanê bidime xuyakirin.



Dîploma te li ser kîjan beşa muzîkê hatiye wergirtin?

→ Min dîploma xwe li welatê Gürcistanê û li ser profation vîyolînê wergirtiye yanî min teza xwe li ser vîyolînê xelas kiriyê. Ez di solîst orkestrayê de mamoste bûm û min teza xwe li ser vîyolînê stand.

Kî dikare xwendina bilind bixwîne?

→ Her kes dikare... Bo nimûne dikare teoriya besteyê bixwîne, lê ger kes ji aliyê xwe de dixwaze ji bo muzîkê di ruh û canê wî de tunebe, nikare besteyan bixwîne. Hinek kes jî bi rengekî otomatîk dikarin her tiştî bikin, lê ew ruhê pêwîst e ji bo karûbarê muzîkê di canê wan de tunebe.

Baş e. Rewşa muzîka kurdî niha çawa tê ber çavê we?

→ Di xebata muzîka kurdî de heta niha bi giranî gelê me li ser muzîka gelêrî rawestiyaye û ew raver kiriyê. Lê

iro em dibînin gelek bestekarên kurd rabûne û bi awayekî zanistî li ser muzîkê dixebitîm. Li televîzyonê bi sazîkirina panelan gelek gotûbêj tên çêkirin. Muzîsyenên kurd li dora hev kom dibin û gelek problem tên çareser kirin. Bi kurtayî muzîka kurdî bi pêş dikeve. Min li Akademiya Çand û Hunera Kurdî bi gelek hunermendên kurd re nasyarî peyda kir, mîna kek Berzan, Necan Emin, Mamoste Qadir Dîlan û gelek kesên din. Li ser tema kurdî gelek besteyên wan hene û bîngeha besteyên wan li ser tema kurdî hatiye avakirin.

Kurdî daye me. Di vê saziyê de gelek alîkarî ji bo muzîsyenên kurd tene kirin.

Bi dîtina te kurd dikarin bêjin: Em jî xwedî muzîkeke neteweyî ne?

→ Belê, çawa nikarin! Pir neteweyan ji muzîka me dizîne. Em xwedî muzîkeke gelek berfireh û dewlemend in, tirk û ermenî li ser muzîka me gelek stranan çêdikin, muzîka me didizîm, bi xwe jî vî rastiyê venaşêrin. Bo nimûne bîngeha konserta soloviyolîn a Mamoste nemir Xaçatoryan li ser muzîka kurdî ava bûye. Jixwe wî bi xwe jî gotûbû: "Dema min li muzîka kurdî guhdar kir, dilê min gelekî pê êşiya." Em dibînin mirovekî wisa mezin dîtina wî li ser muzîka kurdî çawa ye!

Tu di bin tesîra kê de bûyî muzîsyen?

→ Bi rastî ez jî nîzanim çawa çêbû. Ez di nava malbateke muzîkperwer de mezin bûm. Diya min di nava civakê kurdan de, di şahî û dawetan de tim distirî. Niha jî stranên resen ên kurdî baş dixwîne, bavê min jî li def û zimayê dixê. Diya min gelekî ji vîyolînê hez dikir, min dixwest li ser piyanoyê bixebitîm. Lê di dibistana muzîkê de mamosteyê ku li ser xebata şagirtên dibistanê disekîni, gote min: "Hunera te ji bo kemanê pir bi hêz e." Diya min jî bi vî biryarê wan pir kêfxweş bû, ji ber ku ji kemanê hez dikir.

Di pêşerojê de ez jî dixwazim bi stûdî xwe ya taybet hinek stranan bixwînim. Lê niha ez bi nivîsandina besteyan mijûl im. Bi dengê xwe jî kul û kovanên gelek xwe yê perîşan binim ser zimên, lewra giriftariyên neteweya me gelek in, muzîka me ji muzîka Rojava jî bêpar e, lê dîsa jî muzîka kurdî li ser koka xwe ya resen û folklorî maye. Mîrov dikare li ser tema kurdî muzîka klasîk biafrîne. Ji ber ku muzîka klasîk zimanê cihanê ye, bi zimanê cihanê em jî dikarin problemên xwe binin ser zimên.

Jinên kurd ên hunermend di Kurdistanê de kêr in, bi dîtina te çima?

→ Belê. Bi rastî daxbariyê mezin e. Jinên kurd di hemû warên jiyandê de bi pêş ketine. Keçên me li serê çiyayê Kurdistanê ji bo serxwebûna welatê xwe dikin. Divê jinên hunermend jî êdî sal bi sal zêde bibin û baş dixebitîm. Lê ez tenê dibêjim; Ger keç û jinên kurd dixwazim di warê hunerî de bixebitîm, bila bi şeweyên zanistî li ser hunerê rawestîm.